SERETAYÎ

# ZIMANÊ KURDÎ 4

## AMADEKAR

Ev pirtûk, bi sûdwergirtina ji pirtûkên Mexmûrê, ji aliyê Komîsyona Pirtûkan a Rojavayê Kurdistanê ve hatiye amadekirin.

**Ev pirtûk, ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

## NAVEROK

**BEŞA 1 ........ 5**
GUHDARKIRIN ........ 5
SIVORIYÊ ŞIRÎN........ 10
SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ ........ 12
BIHUŞTA SERZEMÎN ........ 15
GOTINÊN GIRÎNG ........ 18
MÊVANA ŞEVEKÊ ........ 19
MIJARA SERBEST ........ 22
RENGÊ JIYANÊ ........ 22
ZIMAN Û ÇAND ........ 23
ALA RENGÎN ........ 26
BAJARÊ TIRBESPIYÊ ........ 29
MIJARA SERBEST ........ 31
TEVDÎRA MIŞKAN ........ 31
TEST-1 ........ 32
**BEŞA 2 ........ 36**
ŞIVAN ........ 36
GOTINÊN PÊŞIYAN ........ 40
ÇAND Û HUNER........ 41
MAMIK ........ 44
HIZIR Û ZANIST ........ 45
MAMOSTEYA MIN ........ 48
ŞÊR, ROVÎ Û XEZAL ........ 51
MIJARA SERBEST ........ 54
ZEMBÎLFIROŞ ........ 54
KOÇBERÎ Û WELATPARÊZÎ ........ 55
LI SER WERÎS ARD HATIYE RAXISTIN ........ 60
MIJARA SERBEST ........ 63
WERZÎŞ ........ 63
XWENDINA ROJNAMEYÊ ........ 66
TEST-2 ........ 69
**BEŞA 3 ........ 71**
GER EM LI HEV BIN ........ 71
ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ ........ 73
NAMEYA JI BO HÊVIYÊ ........ 76
HINDO Û RINDO ........ 79

SEMBOLA BERXWEDANÊ ........ 83
MAF ........ 86
GIMGIMOKA BIÇÛK ........ 88
WELATÊ ME ........ 92
TEST-3 ........ 95
**BEŞA 4 ........ 99**
AZADÎ ........ 99
PÎREMÊRD ........ 102
BIHARA WELATÊ ME ........ 104
KARÊ ÎRO NEHÊLE SIBE ........ 107
GEŞTA LI PERAVÊN GOLA WANÊ ........ 110
AZADIYA TÛTÎ JI RIKEHÊ ........ 113
DEHLA ME ........ 116
SELEMÊŞ ........ 118
CÛDIYÊ MIRADAN ........ 122
ŞÊWAZA AXAFTINÊ ........ 124
HÊVIYA BARANÊ ........ 126
COTKARÎ ........ 130
TEST - 4 ........ 132

# BEŞA 1

## GUHDARKIRIN



Yek ji karê ku em her roj dikin, guhdarkirin e. Em rojê sê-çar demjimêrên xwe ji vê re vediqetînin. Em li malê guhdarî dê û bav, li dibistanê jî guhdarî heval û mamosteyên xwe dikin. Bi kurtahî, guhdarkirin di jiyana me ya rojane de cihekî girîng digire.

Guhdarkirin jî wekî xwendinê ye. Dema em dixwînin, em fêrî hest û ramanên kesên din dibin. Bi guhdarkirinê jî, em fêrî heman tiştî dibin. Bi vî awayî, guhdarkirin destpêka riya fêrbûnê ye.



Ji bo em bibin guhdarên baş, pêwîstî bi hinek hînbûnan heye:
Guhdarên baş ne tenê bi çavan, bi pirsan jî guhdar dikin; li ser mijara ku tê axaftin zêdetir lêkolîn dikin. Timî li bersiva pirsên ku di serê wan de çêbûne digerin. Guhdarên baş bi hedar in. Heta dawiyê, axaftinê dişopînin. Dibe ku bi axaftinê re ne hembîr bin. Lê, tu caran axaftinê nabirin. Ger pirsên wan hebin, piştî ku axaftin bi dawî dibe, dipirsin. Guhdarên baş mijara ku guhdarkirine baş dinirxînin. Nirxandina tiştên hatine guhdarkirin, karekî herî girîng e. Mînak: Armanca yê diaxive çi ye? Gelo şîretan dike, yan jî di derbarê mijareke diyar de, hinek rastiyan vedibêje? Dema vê dike, bi xurûş dibe an na? Ramanan diguherîne û ji heyîna wan mezintir dike an na? Nirxandina van pirsan û pirsên weke van jî, karê guhdarên baş e. Hinek guhdar hene dema ku yek diaxive, bêdeng dimînin û çavên xwe ji ser kesê ku diaxive danayînin. Ku çav li yê daxive, bal û hiş li dereke din be, ew ne taybetmendiyên guhdarên baş in.

Hinek guhdar, têkiliyên wan ne bi axaftinan re, bi kesên ku diaxivin re ne. Li cil û berg û lêvên bêjer dinêrin. Ev jî, ne guhdarên baş in.

## Wateya Peyvan

**Hembîr:** Hemhizir, hemraman
**Bêjer:** Axaftvan, kesê diaxive
**Hedar:** Sebir, aram
**Xurûş:** Kelecan, heyecan
**Raman:** hizir

## Em Têbigihin

1- Tu di jiyana xwe ya rojane de herî zêde kê û çi guhdar dikî?
2- Di nivîsê de xwendin û guhdarkirin bi kîjan aliyên xwe ve hatine pêşberî hev?
3- Pêwîst e guhdarên baş, fêrî kîjan hînbûnan bibin?
4- Encama ku te ji mijarê derxistiye, bêje. Em ji vê encamê re dibêjin ramana bingehîn e.

## Rêziman

Abaceya kurdî ji 31 tîpan pêk tê. Tê de 23 tîpên dengdar û 8 dengdêr hene.

**Tîpên dengdar:**

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

**Tîpên dengdêr:**

a e ê i î o u û

Ji tîpên dengdêr 3 dengkurt in û 5 dengdirêj in.

Dengdêrên dengkurt:

e i u

Dengdêrên dengdirêj:

a ê î o û

## HÎNDARÎ

1- Li ser pirsên li jêr bihizirin û piştre jî bi çend hevokên birêkûpêk bersiva wan bidin.

-Dema em bi kesên pêşberî xwe re diaxivin, divê em li çi tiştî şiyar bin?
- Her dem rûkenîn, çi sûdê dide me?
2-Dema tu guhdar dikî, bala xwe nede tiştên din. Ji bo baş têgihiştina tiştên ku tu dixwînî, bixebite.

# SIVORIYÊ ŞIRÎN



Mala me li cihekî bilind bû. Paceya me li aliyê baxçe, yê tenha û bi şînkahî bû. Dema ez tenê dimam, ji xwe re li ber paceyê rûdiniştim. Min li şînkahî û darên ku li ber bayê dilîstin temaşe dikir. Kêfa min gelekî ji deng û awazên çûkan re dihat, hebûna wan rengîniyek dida xwezayê. Min bi vî awayî, çavên xwe şad dikirin. Carinan sivoriyekî pir şirînok, ji darê dadiket xwarê û bi xwehilavêtinan li ser çîmenan digeriya. Xwarina ku li erdê didît, dixist nava destên xwe û radibû ser lingan. Bi çavên xwe yên biçûk, li derdorê dinêrî û xwarina xwe dikiritand.

Ez sivoriyan ji nêz ve dinasim. Zarokatiya min li herêmeke çiyayî derbas bûye. Li wê derê, me bi lawiran re dilîst, bi taybetî jî, bi sivoriyan re. Ji ber ku sivorî lawirekî zîrek û nêzî mirov e. Dema ku mirov lawiran ji nêz ve dinase, ji xwezayê zêdetir hez dike û bi xwezayê ve tê girêdan. Lawir, xemla xwezayê ne.

## Wateya Peyvan

**Tenha:** Aramî, bêdengî
**Sivorî:** Sivore, simore
**Pace:** şibake, pencere

## Em Têbigihin

1- Dema nivîskar li mala xwe bi tenê dimîne, bi çi bêhna xwe vedike?
2- Zarokatiya nivîskar, li kû derbas bûye?

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Van tîpan bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîsin. Heta ku hûn rast binivîsin, nivîsîna tîpan bidomînin.

**B L Î K D O E Q Ê C S P T X A H W J M N Ç R Ş F U Z Û G I V Y**

c e y t h k a ç s n ê g u q î l o p d v f b r w x i m z j û ş


# SERPÊHATIYA PIRTÛKÊ

Li welatekî çapxaneyek hebû. Desteyên kaxezan di çapxaneyê de dest bi pesindanê kirin. "Em nebin, pirtûkek nayê çapkirin. Em nebin, tu yê li kû derê binivîsî pênûsa nikilbaz! Em nebin tu yê bi çi berg bikî?”

Pênûsê: "A rast ez nenivîsim, kaxeza virt û vala wê bi kêrî çi bê?" Piştre bergê pirtûkê tevlî axaftinê bû û wiha got: "Tiştê ku we tîne rewşa kêrhatina kar, heybeta min e."

Xwediyê çapxaneya li jor û nivîskar pev çûbûn. Nivîskar xwe qure dike û dibêje: "Ez rûnenim û pirtûkên delal nenivîsim, hûn ê çi bikin?" Xwediyê çapxaneyê jî li hemberî nivîskar derdikeve û dibêje: "Ez pirtûkên te çap nekim, wê kî te binase! Kî dê ramanên te bixwîne?" Ên li çapxaneyê dixebitin jî, tevlî nîqaşan dibin: "Kes me nabîne, em nebin wê kî pirtûkan çap bike?"





Roj hatibû. Her kesên ji hev bêhay, biryara karnekirinê dabûn. Vê carê jî, yên ji pirtûkan hez dikin, dest bi silbûnê kiribûn. Wisa li wan hatibû ku nedikarîn pirtûkan bibînin û bixwînin.

Di dawiyê de dinêrin ku çênabe; di encamê de tevahiya derdorên têkildarî mijarê tên gel hev, dest bi lêgerîna çareseriyê dikin. Li welatekî cîran, bapîrekî zana û rihspî hebû. Diçin cem wî û derdê xwe jê re dibêjin. Bapîr, yek bi yek li wan guhdar dike. Hemûyan bi gotina " ez nebim..." û dest bi axaftinê kirin. Bapîr: "Hûn hemû hev û du temam dikin. Bi tena serê xwe kes bi kêrî tiştekî nayê."

Hemûyan ji kiryarên xwe şerm kirin. Her kes vegeriya û dest bi karê xwe yê berê kir.






## Wateya Peyvan

**Heybet**: Mezinahî
**Qure**: xwemezindîtin
**Silbûn**: Xeyidîn, enirîn

## Em Têbigihin

1- Lehengên sereke yên vê mijarê kî û çi ne?
2- Di navbera pênûs û kaxezê de çi derbas dibe?
3- Çima yên ku ji pirtûkan hez dikin, dixeyidin?
4- Bapîr, şîreteke çawa li wan kir? Ev şîreta hatî kirin dibe cewherê mijarê? Çima?
5- Ev mijar, nivîsîna bûyerekê ye. Bûyerên di mijarê de rêz bikin.

## Rêziman

Qertafên sazker: Ji qertafên ku ji peyvekê, peyveke nû saz dikin re qertafên sazker tê gotin.
Hin qertafên sazker: "-van , -dank , -istan , -geh , ve- , ra-"
Mînak:
Ga+van= gavan, nêçîr+van= nêçîrvan
Gul+dank= guldank, pênûs+dank= pênûsdank
Kurd+istan= Kurdistan, dar+istan= daristan
Kar+geh= kargeh, zanîn+geh= zanîngeh
Ve+kirin= vekirin, ve+xwarin= vexwarin
Ra+ketin= raketin, ra+xistin= raxistin

# BIHUŞTA SERZEMÎN





Ev ax, axa min e
Diya giyana min e
Ji min re kaniya jîn e
Ez Mem im ew jî Zîn

Ez geriyam li welat
Min qet xew nekir yek kat
Xweşiya vê bihuştê
Her kesî dihêle mat

Ez çûme wan zozanan
Kêlê û Fereşînan
Delav û Şerefdînan
Tev bingehê evînan

Ser rûyê te girt zemîn
Parçeyek axa şirîn
Rûyek geş û bi evîn
Dikuje di dil de kîn

Darên berû binirx in
Spîndar pir û bilind in
Gûz hêjayî dîtinê
Behîv jî gelek rind in

Çiyayan ez gêj kirim
Pey xwe har û dîn kirim
Parêzvaniya wan jî
Ji xewê şiyar kirim

## Wateya Peyvan

**Kela Memê:** Çiya û Zozaneke ku li herêma Qilebanê ye.
**Fereşîn:** Zozaneke li herêma Elkehê ye.
**Delav:** Zozanên Berê Deriyan
**Şerefdîn:** Çiya û Zozaneke ku di navbera herêma Mûş û Çewlikê de ye.
**Zemîn:** Erd
**Kîn:** jêheznekirin
**Nirx:** Buha

## Em Têbigihin

1- Dema hozan li welat digere, çi tiştên balkêş û xweşik dibîne?
2- Hozên girîngiya axê di malika duyem de çawa aniye ziman?
3- Malika sêyan, kîjan taybetmendiyên bihuşta serzemîn dide diyarkirin?
4- Hozan, ji kîjan taybetiya bihuştê mat dibe?
5- Hozên, çima ji welatê xwe re gotiye: "***Bihuşta Serzemîn***"? Welatê wî li kû derê ye?

## Rêziman

- Ji hevokên li jêr, peyvên: "axa, çûme, çiyayan," hatine derxistin. Van peyvan cardin li cihê wan binivîsin.

Ev axa, ............min e.
.......... ez gêj kirim.
Ez ............wan zozanan.

Her peyveke li jêr, di hevokekê de bi kar bînin.
"behîv, Fereşîn, gêj."

- Ji wan navên ku heyînekê bi tenê didin nasîn re **navên taybet** tê gotin.

**Mînak:**
Azad, Delal, Arîn, Qamişlo, Amed, Kurdistan ...

Navên ku di hevoka li jêr de hatine reşkirin, navên taybet in.
**Zîlan, Dilşa, Serdar** û **Şîlan** çûn dibistana Şehîd **KOÇERÎN.**

## HÎNDARÎ

1- Bedewbûna welatê xwe, bi çend hevokan şîrove bike.
2- Em çima ji welatê xwe hez dikin? Bi nivîskî veke.
3- Li ferhengoka xwe binêre, ka çi wateya "mat" heye?
Ev peyv li ku derê tê bikaranîn?

## GOTINÊN GIRÎNG

- Ta wekhevî û azadiya bi jinê re çênebe, azadî û wekheviya civakê çênabe.(Abdulah Ocalan)

- Di cîhanê de tiştek bi rûmetir nîne.(Hoşimîn)

- Baş bihizire, xweş biaxive û rast pêk bîne. (Zerdeşt)

- Pêxemberî: serokatiya mezin a civakê ye. (Abdulah Ocalan)
- Jiyana şaş, rast nayê jiyîn.  (Adorno)

- Ez bi tenê tiştekî dizanim; ew jî ew e ku, ez tu tiştekî nizanim. ( Sokrates)

# MÊVANA ŞEVEKÊ



Şeveke payîzê ez zû vegeriyabûm malê. Piştî min destên xwe şûştin, çûm hundirê pêjgehê. Min dît di paceya pêjgehê de reşek dilive. Min ronahî pêxist. Ez nêzîk bûm û min lê nêrî. Kevokek di valahiya pêşiya pacê de bi cih bûbû. Dema ez dîtim, çengên xwe li ba xistin û bû qubquba wê. Nexweş xuya dikir; dibe ku ji ber seqetiya xwe nikarîbû bifire û ji bo ewlekariya xwe ev der hilbijartibû.

Min nezanî ka ji êşe zêde, an jî ji westiyanê. Biryar dabû ku şeva xwe li vir derbas bike.

Ji bo ku neêşe, min ronahî vemirand.

Piştî demekê hevjîna min hat. Min jê re got: "Îşev mêvaneke me heye." Çav li hundir gerand. Dema kes nedît, pirs kir: "Ka?" Min ew bir pêjgehê. Min pace nîşanî wê da. Mêvana me, amadekariya raketinê dikir.

Wê şevê em her du jî li ser xwarinê kêfxweş bûn. me bi bîr anî, dema em zarok bûn, ji dibistanê vedigeriyan, em bi mêvaneke şevê re bihatina pêşberî hev, em çi qas kêfxweş dibûn.

Ji bo ku mêvana me aciz nebe, me dengê xwe kêm kir. Me got ku dema bibe sibeh, em ê paceyê vekin; birinc û parçeyên nan bidin mêvana xwe. Roja din, sibê zû ez ji xewê rabûm, bezîm pêjgehê. Lê hinek pirtik li cihê mêvana me ya şevê mabûn. Ez hizirîm ku, "ji min zûtir rabûye û çûye."

## Wateya Peyvan

**Pêjgeh**: cihê çêkirina xwarinan.

## Em Têbigihin

1- Di vê bîranînê de bi rêzê ve kîjan bûyer derbas dibin?
2- Çima kevokê ew der hilbijartibû ?
3- Nêzîkatiya nivîskar û hevjîna wî ji kevokê re çawa bû ?

## Rêziman

**Kite:**
Ji beşa peyvê ya ku bi carekê re ji devê mirov derdikeve re kite tê gotin.
**Mînak:**
Min ronahî vemirand
Min ro–na–hî ve–mi–rand.

Van hevokên li jêr di lênûsa xwe de kite bikin:
- Adar e sibehê sar e, nîvro bihar e.
- Baran ji ewrên reş tê, kar ji dilê xweş tê.
- mala pîrê xweştir e ji qesra mîrê.

## HÎNDARÎ

Nivîskar, di mijarê de li pêşiya hatina kevokê ya li pêşiya paceya vekirî, bi vî awayî dest bi nivîsê kiriye.

Bi danûstendina xwe û hevjîna xwe ya bi kevokê re nivîsa xwe bi pêş xistiye. Bi benda çûna kevokê ji malê, mijara xwe bi dawî kiriye. Tu jî mijarekê li gorî plana li jêr binivîse.

- Di beşa destpêkê de bîranîna te bi kîjan lawirê re têkildar e, bûyerê li kû derê û çawa dest pê kiriye diyar bike.
- Di beşa naverokê de têkiliya xwe û lawiran veke.
- Di beşa encamê de jî, bûyer çawa bi dawî dibe û bandora ku li ser te hiştiye çi ye, diyar bike.

## MIJARA SERBEST

# RENGÊ JIYANÊ

Em zarok in zarok in
Can û pak û xweşkok in
Kenê ser rûyên me
Tev helbest û çîrok in

Em in xemla cîhanê
Deng û rengên jiyanê

Li ser singê vê jînê
Em in para evînê

Derî vekin em hatin
Em hêvî û xelat in




# ZIMAN Û ÇAND

Ziman bi çandê re di nava têkiliyeke pir xurt de ye û di bingeh de têgîna sereke ya çandê ye. Mirov hestên xwe, hizirînên xwe û pêwîstiyên xwe bi ziman rave dike. Ziman daneheva civakî ya hizir û hestên ku civakekê bi dest xistine ye. Ziman, girîngiya têkiliya mirovên di civakê de dide zanîn û zindî dike.

Ji ber vê yekê, bikaranîna ziman di pêşketina civakan de cihekî girîng digire.

Civakek, bi parastin û pêşxistina zimanê xwe, hebûna xwe diyar dike. Civaka ku dibe xwedî ziman tê wê wateyê ku ew civak bûye xwedî sedemeke pir xurt a jiyanê. Asta pêşketina ziman asta pêşketina jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê zikmakî çi qas pêş xistibe, ew qasî jî asta jiyana xwe pêş xistiye. Hatina civakan a heya roja îro, girêdayî pêkanîn û pêşketina ziman e. Ziman, têgehên çandê ji nifşekî, radigihîne nifşekî din. Cihê ku ziman û hizirîn lê hebin, pir bi hêsanî dewlemendiya çandê lê tê dîtin. Çand bi xwe, bi awayekî herî berfireh pênasekirina ziman û hizirê ye.





## Wateya Peyvan

**Têgîn:**têgeh

## Em Têbigihin

1- Ziman çi ye?
2- Têkiliya di navbera çand û ziman de çi ye?
3- Ramana bingehîn a mijarê çi ye?

## Rêziman

1-Peyvên weke; "Hesekê, Qamişlo, Efrîn" serenav in. Tîpên destpêka van peyvan, çawa hatine nivîsîn?

2- Di nivîsê de sê hevenavan bibîne û di lênûsa xwe de binivîse. Çi cudahî di navbera nivîsîna serenav û hevenavan de heye?
3- Sergotara mijarê, ji çend peyvan pêk hatiye?
Em, ji encama ku ji mijarekê bi giştî hatî derxistin re dibêjin **Ramana bingehîn**..

## HÎNDARÎ

**1**- Zimanê Kurdî yê ku di bin çewisandin û zorê de pêşketina xwe didomîne, xwediyê çi taybetmendiyan e?
**2**- Çima em giringiyê didin ziman, wêje û çanda Kurdî?

# ALA RENGÎN



Ala rengîn kesk, sor û zer
Te hildim jor, xwe bidim ber
Roja şadî û şahiyan
Silav bidim li hember

Tu cewher û xemla me yî
Tu ronahiya çavên me yî
Te hildim li Kurdistanê
Daxwaziya dilê me yî

Ala rengîn tu şirîn î
Kesk û sor û zêrîn î
Cewher bi rima zîvîn î
Silavên germ distînî

Feqîr Ehmed

## Wateya Peyvan

**Hildim:** Rakim
**Şahî:** Kêfxweşî
**Cewher:** naverok, kakila mijarê
**Rim:** Darekî dirêj û serê wî tûj e

## Em Têbigehin

1- Di sirûdê de çend malik hene?
2- Di her rêzekê de çend kîte hene?
3- Li dawiya rêzan, di navbera kîjan peyvan de wekheviya deng tê dîtin?
4- Tu ji gotina: "Tu cewher û xemla me yî." çi fêr dibî?

## Rêziman

- Sirûd beşeke mûzîkê ye. Bi mûzîk û naveroka xwe, ji helbestan cuda dibe. Cihê lê tê bikaranîn, ji helbestê cuda ye. Sirûd, neteweyî ne û di rojên pîroz û taybet de tên gotin.
- Di helbestê de gelek navên mîna: "Al, Sor..." ku hatine nivîsîn, hene, dema ku tîpek jê tê rakirin wateya wê tê guhertin, ji wan peyvan re dibêjin **navên xwerû**.

## HÎNDARÎ

Di refê de, ji xort û keçan du koman ava bikin. Bi rêveberiya mamoste bi awayê keç û xort, bi rêzê ve malikan bixwînin.

Li jêr hevokek heye. Li pey vê hevokê, çar-pênc hevokên parastin û girîngiya alê didin binivîsin.

**"Ala me, nûnertiya neteweya me dike."**

# BAJARÊ TIRBESPIYÊ






Bajarê Tirbespiyê li deşta Cizîrê ye. Li kantona Cizîrê, di navbera bajarê Qamişlo û Dêrikê de cih digire.

Cihê vî bajarî balkêş e, bajar û navçeyên weke: Dêrik, Girkêlegê û Çilaxe bi Qamişlo ve girê dide.

Navê bajêr, ji du gorên kevin yên ku ji gêçê û li destpêka bajêr hatibûn çêkirin, tê.

Tirbespiyê, bi çandiniya dexil û dan bi nav û deng e, ew jî bi baranê ve girêdayî ye, ango çandaniya bejahî ye. Du bendav lê hene: ya Mizgeft û Maşoqê.

Ji derveyî vê, şêniyên bajêr debara xwe bi xwedîkirina ajalên weke: pez û dewaran dikin. Tu kargeh lê tunene. Lê, ew bi petrolê dewlemend e. Tê de bêhtirî 200 bîrên petrolê hene.

Serjimariya bajêr kêm e, nêzî 25 hezarî ye. Niştecihên wê, ji pêkhateyên Kurd, Êzidî, Suryan û Ereb pêk tên. Di navbera wan de jiyaneke hevbeş û wekhev heye. Her çi qasî, bajarekî ku di hêla bermahiyên dîrokî de dewlemend e jî lê mixabin tu lêkolînên dîrokî li ser nehatine kirin. Ji bilî gundê Girê Lêlanê ku perestgeha Şobatinlîl ya asûriyan tê de hatibû avakirin.

Gundên mezin ên ku bi bajêr ve girêdayî ne, ev in: Maşoq, Girdêm, Beyandûr, Dêrûna Qulingan û Tilxatûn.

Her wiha, di bajêr de bazareke heye, ku di dema niha de bi rêk û pêk û firehtir bûye.

## Wateya Peyvan

**Gêç: Kils**
**Serjimêr:** Jimara giştî (nifûs)
**Perestgeh:** Cihên perestinê (cihê îbadetên olî)

## Em Têbigihin

1- Bajarê Tirbespiyê li kû derê cih digire?
2- Bajêr, navê xwe ji çi girtiye?
3- Debara niştecihên bajêr, li ser çi ye?
4-Niştecihên bajêr, ji kîjan pêkhateyan pêk tên?

## Rêziman

1-Di hevoka jêr de çend kite hene?

Du bendav li bajêr hene.

2-Di her kiteyekê de çend tîpên dengdêr hene?

Weke ku tu jî dibînî; tîpên dengdêr bi tena xwe deng didin, bi tena xwe dibin kite. Ên dengdar, bi dengdêran re tên bilêvkirin.

## HÎNDARÎ

1- Mijara te xwendî, bi kurtahî binivîse.
2- Di vê mijarê de, te kîjan taybetmendiyên Tirbespiyê nasî?
3- Bîranîneke xwe ya ku girêdayî gera te ya li cihekî ye, di refê de vebêje.

MIJARA SERBEST



# TEVDÎRA MIŞKAN

Li welatê Mêrdînê
Di nav gundê Cilînê
Pisîkeke xurt û şeng
Bûbû xudan nav û deng
Mişk nehiştin di malan
Giş revîn qul û çalan
Kîjanê wan dihat der
Pisîk xwe zû davêt ser
Welê mabûn mat û gêj
Yekî wan î boçdirêj
Digot: Gelî hevalan
Em girtî man di çalan
Rêkê bo me çar bikin
An jî ji vir bar bikin
Mişk neman tev dicivîn
Bo vê yekê peyivîn
Her yekî yek digotin
Kezeb ji xwe disotin
Yekî wan î rîspî
Digot: Ev e min rê dî
Du zengilan bibînin
Bidin yekî bişînin
Heke li ku pisîk dî
Bila têxe situyê wî
Çi gav dengê zengil bê
Wer zanibin ku ew tê
Bi lez û bez veşêrin
Nema hûn kes dimirin
Gişkan digot: Welê ye!
Ev tevdîreke li rê ye
Lê di nav xwe kes nedîn
Ku wî karî biqedîn
Pisîk serbest hiliştin
Wî jî her ew dikuştin.

*Osman Sebrî*



# TEST-1

**Ez li çavên wê yên morîkî yên reş dinêrim. Rexên wan sorik in. Wekî bihizire: Ma çûk dihizirin? Bawer bikin ew dihizire. Dibe ku ji ber êşan wiha xuya dike. Min li rex dara biyê ya mezin a li ber êş dîtibû. Çengên xwe dixişikandin û dixwest bifire, lê bêhêz bû. Çeng sor e. Her bêhnekê, nikilê wê yê dirêj vedibû û dihat girtin. Dilê wê yê biçûk di destê min de tik tik bi lez lê dida. Min digot, wê dilê wê bisekine û çavên wê bên girtin. Dilê min dilerizî...**

***Bersiva her du pirsên destpêkê, li gorî nivîsa jor bide.***

**1- Mijara ku di vê nivîsê de li ser tê rawestandin, kîjan ji yên li jêr e?**

**a)** Hezkirina xwezayê.
**b)** Şadiya hewaya vekirî.
**c)** Bêrîkirina firînê.

**2- Em nikarin kîjan gotinên li jêr, li şûna gotina "*Dilê min dilerizî*" ya di mijarê de bi kar bînin?**

**a)** Gelek bêzar dibim.
**c)** Gelek ditirsim.
**b)** Gelek şad dibim.

**3- Tu ji beşa "*naverok*"ê ya pirtûkan çi fêr dibî?**

**a)** Çawa peyv tên nivîsîn.
**b)** Xwendina mijaran.
**c)** Mijarên di pirtûkê de, di kîjan rûpelan de cih digirin.

**4- ji yên li jêr, Kîjan ne li gorî rêza tîpan tê nivîsîn?**

**a)** Pirtûka waneyan.
**b)** Ferhengoka li dawiya pirtûkên waneyan.
**c)** Ferheng.

**5- Nivîsîna kîjan peyva li jêr, şaş e?**

**a)** Pir **b)** Çal **c)** Pêrtûk

**6- kîjan pênaseya navên taybet e?**

a) Navên ku gelek heyînan diyar dikin.
b) Navên ku heman wateyê didin.
c) Navên ku bi tenê heyînekê diyar dikin.

**7-Nîşaneya pirsê nakeve dawiya kîjan hevoka li jêr?**

**a)** We ji bo azadiya xwe çi kir.
**b)** Hûn çima naçin dibistanê.
**c)** Em îro zû ji dibistanê hatin.

**8- Di kîjan hevoka jêr de navê tabet tuneye?**

**a)** Bajar, deşt û çiya man di bin berfê de.
**b)** Firat û Dîcle dem deman diqerisin.
**c)** Li Dirbêsiyê jî germahî şkest.

**9- Hevokên li jêr ya rast bi (R) û ya şaş jî bi (Ş) nîşan bikin?**

**a)** Dijwateya peyva nêzîk, peyva dûr e. (...)

**b)** Peyva "pel" navekî pirjimar e. (...)

**c) Nî**şaneya pirsê, li dawiya hevokên balkêş tê bikaranîn. (...)


**d)** Em dikarin, li şûna peyva: "xurûş", peyva "kelecan" jî bi kar bînin. (...)

# BEŞA 2

## ŞIVAN

Têm û diçim deşt û şax
Derbas dikim dem û çax
Ber sêber û helava
Ser nefel û berava
Car nizar û car pesar
Mêrg û çîmen, avên sar
Dîmen geş in seranser
Sor û spî û kesk û zer
Tev dar û gul û giya
Wek bihuşt in ev çiya
Bilbil û kew dixwînin
Xemên dil direvînin
Seyê min tim şiyar e
Neyarê gurê har e
Nêrî kever pêşeng e
Zengil bi qîr û deng e
Ku pezê min dibûrê
Ez pif dikim bilûrê
Ev karê min xebat e
Ji bo min û welat e

*Sebrî BOTANÎ*



## Wateya Peyvan

**Çax**: Dem, wext
**Helav:** Lêlav
**Sêber:** Sîber
**Nefel:** Giyayekî sê pel û bi kulîlk e.
**Nizar:** Pala ber sih
**Pesar:** Erda paldayî
**Dîmen**: Xuyang, Dîtinên xuyayî

## Em Têbigihin

1- Li gorî helbestvanî, çiya çawa ye?
2- Encameke çawa ji bo helbestê hatiye dayîn?
3- Tu ji hevoka "*Dîmen geş in, seranser*" çi wateyê derdixî?

## Rêziman

**Qertafên pirjimariyê:** "-ên û -an"
Ev qertaf peyvên yekjimar dikin pirjimar.
**Mînak:**
Pirtûk**ên** zarok**an**
Zeviy**ên** gundiy**an**
Dar**ên** gûz**an**
Av**ên** kaniy**an**
Lîstok**ên** biçûk**an**

## HÎNDARÎ

1- Ji bo ku em bibin mirovên welatparêz, pêwîst e em çi bikin?
Di refê de guftûgo bikin.

2- Di dema guftûgoyê de li gorî van destûran tev bigerin:

- Bêyî ku tu mafê axaftinê bistînî, neaxive.
- Nêrînên xwe kurt û vekirî bêje.
- Dernekeve ji derveyî mijarê.
- Bêjer, bi balkêşî guhdar bike.
- Pêwîst e tu hevalên xwe yên nêrînên wan ne wek ên te bin, bi rexneyên rûxîner neşkînî. Rexneyên erênî bike.


## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

**Nivîsa li jêr bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîse**

### Parvekirin

Parvekirin, taybetmendiyeke civaka xwezayî ye. Li vê derê, komcivîn an jî li ser amûr û berheman zêdekirin, tuneye. Xwediyê vê pergalê jin e. Ji ber ku di xwezaya jinê de parvekirin heye.





## GOTINÊN PÊŞIYAN

- Aqilê sivik, barê giran.
- Kevirê giran, li cihê xwe baş e.
- Kedkarê xwe be, ezîzê ber dilê hevalê xwe be.
- Dostê nezan, ji neyarê zana xetertir e.
- Rih dibe bost, dijmin nabe dost.

# ÇAND Û HUNER


Ji bo naskirina gelan, çand û huner cihekî girîng digirin. Dema ku huner tê gotin: wênekêşî, peykertiraşî, avahîsazî, hunerên xemilandinê, şano, mûzîk û wêje tên bîra mirov. Wêneyek, peykerek, avahiyek, awazek, romanek, serpêhatiyek di mirovan de hestên ciwan şiyar dikin. Her wiha, di her demê de jî, ji bo hunerên ciwan girîngiyeke mezin hatiye nîşandan. Girêdayî vê, hunerên ciwan ji bo nasîna gelan, risteke girîng dilîzin. Di hunera Kurdî de gelek tiştên dişibin hev tên dîtin. Ev şibandin, mîna: dengbêjî, govend û lîstinên pandomîm (bêpeyv) in.



Di heman demê de huner bi xwe jî çanda mirovan e. Çand hemû tiştên ku di encama keda mirovan a bi milyonê salan de hatiye afirandin e. Çand, nasnameya kes û civakê ye. Her civak, bi çanda xwe tê nasîn. Mînak: Civaka kurd bi mêvanperweriya xwe, cil û bergên xwe, berxwedêriya xwe û hwd. tê nasîn. Her wiha, her kesek jî bi çanda xwe tê nasîn, ev jî dibe cudahiya kesekî/ê ji kesên din. Çand, ji du aliyan ve tê destgirtin. Ew jî çanda heyberî û çanda rewanî ne. Mînak: avahî, cil û berg, xwarin, teknîk, huner û hwd. çanda heyberî ne: Ol, bawerî, rêzgirtin û hwd. çanda rewanî ne. Çand, di civaka xwezayî de ji ber pêwîstiyên neçarî pêş ketiye.

Her netewe û civak pêwîst e xwedî li çand û hunera xwe derkeve. Ji ber ku her netewe, bi çand û hunera xwe tê nasîn. Em dikarin, bi riya saziyan çand û hunera xwe zêdetir biparêzin.

Ji bo xwedîderketin û pêşxistina çand û hunera kurdî, gelê kurd jî gelek navendên weke: **HUNERKOM, TEV-ÇAND, Navenda Çanda Mezopotamya(NÇM)** û hwd. ava kirine. Xwedîderketina li çand û hunerê, mafê xwezayî yê her civak û neteweyê ye.







## Wateya Peyvan

**Wênekêş:** wênegir, Kesê ku wêneyan dikişîne
**Awaz:** ritim, şêwe û dengê mûzîka stranan.
**Heyberî:** Şênber (madî)
**Rewanî:** Razber (manewî)
**Rist:** Rol

## Em Têbigihin

1- Di mijara we xwendî de navên kîjan huneran derbas dibin?
2- Ji bo nasîna gelan, çi rista hunerê heye?
3-Çand çi ye?
4-Navê du saziyên çand û hunerê binivîse.

## Rêziman

**Daçek**: Ew peyv in ku bi tena serê xwe tu wateyê nadin, lê hevokan ji aliyê wateyê ve sergihayî û temam dikin.

Daçekên bingehîn: bi – ji – li – di ... de

**Mînak:**

**Bi** hevalên xwe re alîkar bin.
Pêwîst e em **ji** dil kar bikin.
Em **li** dibistanê **bi** zimanê xwe dixwînin.
Mirov **di** welatê xwe **de** serbilind e.

## HÎNDARÎ

**1-** Di mijara te xwendî de tiştê tu fêr bûyî, bi çend hevokan di lênûsa xwe de binivîse.
**2-**Li gorî nêrîna te, em ê çawa çand û hunera xwe biparêzin?

## MAMIK

- Ne ker e, ne hêstir e, bar jê mezintir e. (Mûrî)
- Qevdek giya, li pişt çiya. (Kezî)
- Sê ling, sê dar, çar ling pê da, du ling hat û himik lê da. (Meşk)
- Kalê pîr, li civata mîr. (Semawer)
- Xatûneke kirasreş, tama devan dike xweş. (Beroş, Mencel)
- Elî hemal pez bir çeman, sibê rabû kit jê neman. (Stêrk)
- Kalokek tê ji deştê, barê stiriyan li piştê.(Jîjo)

# HIZIR Û ZANIST

Hizirîn û lêkolîn, mirovan digihîne asta zanistî. Bi lêgerîn û lêkolînan hûn jî dikarin bibin zanyar. Dibe ku we xwendibe, Çawa ku Krîstof Kolombos û Byrd (Bord) gelek cihên nû dîtine. Îro zanyar li şûna vedîtina cihên nû, tiştên nû dafirînin. Weke, Edîson bi zanîna xwe elektirîk derxist û cîhana me ronî kir. Graham bêl bi derxistina telefonan rêvebirina kar hêsan kir. Du birayên Rayt jî bi hizirînên xwe balafir derxist. Mirov zûtir gihandin hev.

Rast e mirovan ji zû ve xwe gihandine asta herî bilind. Li gel vê jî hûn dikarin gelek tiştan bibînin. Ev dîtin û destkeftiyên nû, wekî dîtina cihên nû girîng e.

Em çawa dikarin vîtamînên pêwîst di nava xwarinên cuda de bibînin? Em bi çi awayî ji tîrêj û ronahiya rojê sûd bigirin? Gelo cîhanên weke cîhana me hene, yan na?





Gelek pirsgirêkên weke van li benda çareseriya zanyaran mane. Em bihizirin ku hûn dixwazin bibin zanyar. Hûn dixwazin vedîtinan bikin. Hûn ji ceribandinan pir hez dikin. Beriya ku hûn biryara xwe ya dawî ji bo karê zanyariyê bidin pênc pirsên hûn ji xwe bikin hene. Ew pirs jî ev in:

Gelo ez ji karkirinê gelekî hez dikim, an na?

Gelo ez bi hedar im, an na?

Gelo ez hestiyar û baldar im, an na?

Gelo ez xwediyê ramaneke vekirî me, yan na?

Gelo ez dikarim rast bihizirim û bi wijdan tev bigerim, an na?

Heke hûn dikarin ji van pirsan hemûyan re bêjin **"Erê!"** hûn ê di pêşerojê de bibin pêşengên zanyariyê.



## Wateya Peyvan

**Destkeftî:** Tiştên hatine bidestxistin
**Hedar:** Hedan, sebir
**Vedîtin:** Keşfkirin

## Em Têbigihin

1- Edîson û Graham bêl çi derxistine?
2- Kesê ku bixwaze bibe zanyar pêwîst e, kîjan pirsan ji xwe bike?
3- Ji çavkaniyekê fêr bibe, telefon kengî û çawa hatiye çêkirin?

## Rêziman

1- Di hevokên jêr de kîjan peyv pirsê diyar dikin?
Gelo, hûn ji karkirinê hez dikin?
Gelo, ez bi hedar im, an na?
2- Daçekên di hevokên jêr de diyar bikin.
-Wan di malê de pirtûk xwend.
-Me li gel hevalên xwe pirtûk anîn.

## HÎNDARÎ

1-Telefon çawa hat dîtin? Tiştên ku hûn dizanin ji hevalên xwe re bêje.
2-Dema em bi telefonê diaxivin, pêwîst e bi rêzê ve çi bêjin?
3-Li gorî destûrên ku te diyar kirine, axaftineke telefonê amade bike.

# MAMOSTEYA MIN



Ş. Viyan Amara

Ş. Viyan Demir

Ew hem dê ye, hem jî bav e
Bê mûçe û bê dirav e
Bi rojbaş dike silav e
Bi rûkenî dike rave

Tu bê mirinî her dijî
Lewma te dagirtî mejî
Ji çand û wêjeyê tijî
Êdî çewtî nema dijî

Mamosteya min a delal
Bi wî zarê şirîn zelal
Zanîn bo min kiriye mal
Ji bo xwe kirime heval

Mamosteya xwedî raman
Şev û rojê westan nezan
Dixebite bi merg û can
Mirov jê re dibe heyran.

M. Elî

## Wateya Peyvan

**Delal**: Xweşik
**Zarê şirîn**: Zimanê xweş
**Raman**: Hizir
**Heyran**: Pir jê hezkirin
**Mûçe**: Ratib, meaş
**Merg**: Can

## Em Têbigihin

1- Di helbestê de, bi çi awayî behsa mamoste tê kirin?
2- "Êdî çewtî nema dijî."Vê hevokê şîrove bike.
3- li gorî helbestê mamoste ji xwendekaran re çi kiriye mal?

## Rêziman

1- **Lêker:**
Ji peyvên ku kar, tevger û rewşekê diyar dikin re lêker tê gotin.

Mînak:
Em ji bo mafê xwe **dixebitin**.
Me ji ber baranê **baz da**.
Berfîn li gund **dijî**.

2- Van her du hevokên li jêr bixwîne, lêkerên wan diyar bikin.
Mamoste waneyê dide.
Azad pirtûkê dixwîne.

## HÎNDARÎ

1- Te roja mamosteyên xwe çawa pîroz kir? Rave bike.
2- **"Mamoste weke findekê, tîrêjê dide hinekên din"** Tu ji van gotinan çi fêr dibî? Bi dariştineke kurt şîrove bike.
**3-** Helbesteke ku li ser mamoste hatiye nivîsîn, peyda bike, helbestê ji ber bike û li pêşberî refê bixwîne.

Dema tu helbestê ji mamoste guhdar dikî, li van xalan baldar be:

- Mirov li kû derê gelek, li kû derê kêm radiweste?
- Mirov li kû derê dengê xwe bilind û li kû derê dengê xwe kêm dike?

# ŞÊR, ROVÎ Û XEZAL

Şêr gelek nexweş bûbû; çûbû di şikeftekê de razabû. Gazî rovî kir da ku pê re dostaniyê bike û jê re got:

- Eger tu başbûna min bixwazî, tu yê xezala di daristanê de bixapînî. Ez dixwazim dil û mêlaka wê bixwim. Rovî di cih de xwe berda nava daristanê û xezalek dît. Ji bo wê got:

- Paşayê me şêr, niha gelek nexweş e. Hêviyên xwe, ji rabûnê birîne. Biryar girtiye ku paşatiya xwe bide te.



Xezalê bawer kir, ket pey rovî û berê xwe dan şkeftê û çûn. Şêr li ber deriyê şkeftê rawestiyabû. Di cih de xwe avêt li ser pişta xezalê û girt; tenê guhê wê piçekî xwîn kir û berda. Xezal revî û çû xwe li daristanê veşart. lewre, rovî gelek bêzar bû. Hirîna şêr ji cerg û hinavan dihat. Şêr dîsa ji rovî gelek hêvî kir û got:

- Riyekê bibîne, dîsa wê xezalê ji min re bîne. Rovî got:

- Ma xapandina xezalê wisa hêsan e, lê dîsa ez ê biceribînim.

Rovî, xezal di nava daristanê de dît û çû pêşiyê, pirça xezalê qij bû.

- Hey bêbextê bêbexet! De here rovîtiya xwe nîşanî hinekên din bide. Rovî bi gotinên wê bandor nabe û dibêje:

- Şêr, hema wisa ji ber nexweşiyê paşatiya xwe di holê de nahêle. Tu jî ji ber nexweşiya xermişka ku şêr li guhê te dayî, ciniqî! Rovî dîsa xezal xapand û bir şkeftê. Şêr hestî û goştê xezalê bi xweşî xwar. Rovî jî ew dilê ku ketî erdê girt û xwar! Şêr, li dil geriya lê nedît.

Rovî got:

-Ma dilê lawirên bi vî rengî heye? Ger dilê wê hebûya cara duyem nedihat xapandin.

## Wateya Peyvan

**ciniqîn**: tirsîn, tirsa ji tiştekî.
**Dost:** Heval
**Mêlak**: Kezeb

## Em Têbigihin

1- Şêrê nexweş, çi ji rovî xwest?
2- Rovî, xezal bi kîjan peyvan xapand û çi hat serê xezalê?
3- rovî bi kîjan taybetmendiyan tê nasîn?
4-Ger tu li şûna xezalê bûya, te yê çi bikira?

## HÎNDARÎ

**1-** Bûyerên di mijarê de derbas dibin, ji rêzê ve bêje. Ramana bingehîn ya mijarê derxe û li lênûsa xwe binivîse.
**2-** Pirtûkeke te xwendî, bi hevalên xwe bide nasîn. Dema tu danasînê dikî, li ser van xalên jêr, raweste:
  **a-** Navê pirtûkê û nivîskarê wê bêje.
  **b-** Bûyerên di pirtûkê de derbas dibin, bi rêzê ve bêje.
  **c-** Aliyê pirtûkê yê herî zêde te jê hezkirî bêje.
3- Peyv û gotinên ku tu wateya wan nizanî, ji ferhengê bigire û di lênûsa de xwe binivîse.

## MIJARA SERBEST

### ZEMBÎLFIROŞ

Zembîlfiroş zembîlan tîne
Delalo zembîlan tîne
Kolan kolan digerîne
Nan û danî pê distîne
Zarokan pê ditêrîne

Gava ew zembîlan tîne
Xatûn li bircê dibîne
Bi eşqa dil dihebîne
Aqil diçe sewda namîne

Kuro selikan vir de bîne
Mîr dixwaze  te bibîne
Buha buha ji te bistîne
Lawiko ez birîndar im

Xatûna min a delal e
Min bihîstî mîr ne li mal e
Bazaram bi malê helal e
Xatûnê ez tobedar im
Delalê ez tobedar im

Zembîlfiroş lawikê biyanî
Ez dibêjim tu pê dizanî
Min bo eşqa dil tu anî
Lawiko ez evîndar im

Xatûna min a zerîn e
Qusur li ser te qet nîn e
Lê dilêm kesî nabîne
Xatûnê ez tobedarim
Delalê ez tobedarim

# KOÇBERÎ Û WELATPARÊZÎ





Gundê me gundekî pir xweş û dewlemend bû, tevahî şêniyên gundê me bi hev re alîkar bûn. Ji hev pir hez dikirin. Erê erê!... mala xayîn û bêbextan bişewite, gundiyên dilpak nezanîbûn ku ev demeke dirêj e zordar û xwefiroş li ser wan pilanên qirêj datînin.

Îro jî, weke her roj gundî tev serê sibehê zû rabûn ser xwe , her yekî berê xwe da karê xwe. Cotkar çûn cot, bêrîvan çûn bêriyê, şivan û gavanan berê xwe dan çolê, xwendekar çûn dibistanê û bi vî rengî her kesî dest bi karê xwe kir.

Lê îro çerxa felekê li ser serê gundiyên pak, şaş vegeriya. Dagirkeran bi rengekî pir xerab êrîşî gund kirin. Bû teqreqa fîşek û bombeyan! Asîman ji dengê hawar hawara dayîkan û qîreqîra zarokan dilerizî!. Şerekî dijwar dest pê kir. Gundiyan jî bi rengekî pir baş li ber xwe dan, lê mixabin hinek gundiyên tirsonek, ji tirsan re dev ji axa xwe berdan û koçber bûn.

Bi vî rengî çeteyên hov, ketin aliyekî gundê me. Gund tarûmar kirin. Beşek ji gundiyan dev ji axa xwe berdan û koçberî welatên din bûn. Lê tevî vê yekê jî, beşek ji gundiyên ku bi axa xwe ve girêdayî bûn di gund de man , mal û xaka xwe ji êrîşkaran re bernedan.

Kesên bi qehremanî şer dikirin û li ber xwe didan, muhra xwe li rûpelên dîrokê dan. Di heman deme de yên ku dev ji axa xwe berdan û reviyan, çûn welatê xelkê perîşan bûn. Kesên ku di welatê xwe de bimînin bi serbilindî dijîn, dema şehîd bikevin jî dibin pakrewan, heval û hogirên wan dibin şopdarên riya wan, her kes behsa berxwedanî û qehremaniya wan dike. Lê yên ku bi hêsanî dev ji axa xwe berdin û koçber bibin; rezîl û riswa dibin, li ber deriyê xelkê digerin û her kes wan kêm dibîne. Kesên wan nas nekin jî, lê dema dizanin ku dev ji welatê xwe berdane, bi çavekî kêm li wan dinêrin, nebaş tên dîtin. Rast e, bi bihaneya ku nemirin, dev ji welatê xwe berdidin, lê dema dev ji axa xwe berdidin, ji xwe wê demê dimirin.

Kesên ku ji bo jiyanê dimirin, tu caran di bîr û baweriya civaka xwe de namirin, her tim bi serbilindî dijîn. " Divê mirov baş bizane ku mirina ji bo jiyanê, jiyan bi xwe ye".

## Wateya Peyvan

**Gavan:** Kesê li ber dewaran
**Pak:** Baş û paqij
**Tarûmar:** Wêran
**Riswa:** Şerpeze, belengaz

## Em Têbigihin

1- Gundê wan gundekî çawa bû?
2- Çawa êrîş li ser gund çêbû?
3- Kesên welatparêz çawa diyar bûn?

## Rêziman

**Tîpên hilmî û nehilmî (hişk û nerm):** Ji tîpên (ç, k, p, t) ku du dengên ji hev cuda derdixin re tîpên hilmî û nehilmî tê gotin.

Mînak:

| **Hilmî (hişk)** | **Nehilmî (nerm)** |
|---|---|
| Ker (lawir) | Ker (kesên ku nabihîzin) |
| Par (para min) | Par (sala borî) |
| Çal (bizina çal) | Çal (çala avê) |
| Ta (nexweşî) | Ta (dezî) |

## HÎNDARÎ

1- "Girêdana bi welêt ve" di refê de bi hevalên xwe re gotûbêj bikin.
2- Gundê xwe bi kurtasî bidin nasîn.

## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Peyvên li jêr, bi awayekî rast di lênûsa xwe de binivîse. Karê nivîsînê heta tu rast dinivîsî, berdewam bike.

**Bawer – xezal – bihar – mizgîn – kevok – hesp**
**Hêvîdar – gulan – bahoz – serbaz**



# LI SER WERÎS ARD HATIYE RAXISTIN



Rojek ji rojan, cîranekî Behlûl tê mala wî û werîs jê dixwaze. Cîran dest bi hêvî û tikayan dike:

- Dema karê min bi dawî bibe, ez ê bînim. Lê Behlûl nedixwest bide. Hezar û yek astengî ji cîranê xwe re derdixistin.

Gelek sedemên nebûyî afirandin.

Yek ji wan jî:

- Me li ser werîs ard raxistiye.

Cîran got:

-Behlûl, ez benî! Ma ard li ser werîs tê raxistin? Ev çi kar e?

Behlûl bêzar bû:

- Ger min niyaza dayînê nebe, ard jî li ser tê raxistin û genim jî tê raxistin.

## Wateya Peyvan

**Ard:** Ar, heybera ku em pê nan çêdikin.
**Asteng**: Alozî, li pêşiya tiştekî zorî derxistin
**Niyaz**: Mebest, daxwaz (niyet)

## Em Têbigihin

1- Cîran, çi ji Behlûlî dixwaze?
2- Behlûlî çawa bersiv da cîranê xwe?
3- Gotina "Ard li ser werîs raxistiye." tê çi wateyê?

## Rêziman

1- Di mijarê de peyva “raxistin" derbas dibe, li ser peyva “xistin” pêşgira **"ra"** hatiye zêdekirin, em ji van pêşgiran re dibêjin, ***qertafên sazker***.

***Mînak:***

Kirin – **ra**kirin Xistin - **ra**xistin

2- Di mijarê de hevokên axaftinê, bi çi awayî hatine diyarkirin?

## HÎNDARÎ

1- Gelek nivîs di derbarê Behlûl de hene, yekê ji wan peyda bike û binivîse.

2- Pêkenokeke xweş, di lênûsa xwe de binivîse. Dema tu dinivîsî, li gorî rêgezên nivîsê tevbigere. Pêkenoka te nivîsî, ji hevalên xwe re bixwîne.

## MIJARA SERBEST

# WERZÎŞ

Her du waneyên me yên destpêkê bîrkarî bûn. Pir xweş derbas bûn, lê ez pir westiyabûm. Ji ber ku waneya bîrkarî, guhdarkirin û hizirîneke zêde dixwaze. Piştî wê, waneya werzîşê hebû. Hemû xwendevan tim li benda hatina waneya werzîşê ne. Bi vê waneyê, pir şad dibin. Ez jî pir ji vê waneyê hez dikim. Ji ber ku em fêrî gelek beşên werzîş û lîstokan dibin. Mamosteya me hat refê û bi rûkenî got:

Dembaş xwendevanên delal.

Me got:

Dembaş mamoste.

Mamoste got: Zarokên hêja, em ê niha biçin, li baxçeyê dibistanê rêza xwe çêkin û dest bi werzîşa xwe bikin. Zarok hemû pir kêfxweş bûn, ji bo derkevin derve di nava liv û tevgerê de bûn. Ji nişka ve, min destê xwe rakir û pirsî:

Mamoste ! Mamoste !

Mamoste li min nêrî û got: Fermo Xebat.

Mamoste, pirseke min heye; destûr hebe dixwazim bipirsim.

Mamoste got: Belê, dikarî bipirsî, fermo.

Mamoste, werzîş ji bo çi baş e, em çima werzîşê dikin?

Mamoste her du destên xwe dan hev, çend kêliyan çû û hat; bi rûkenî li min nêrî û got:

bi rastî pirsa te pir baş e. Belê werzîş, ji bo mirovan pêwîstiyeke neçarî ye.



Ji bo beden û mejiyekî saxlem, Ji bo jiyaneke temendirêj û derûniyeke baş, pêwîstiya me bi werzîşê heye. Kesê ku werzîşê dike û di nava liv û tevgerên werzîşî de ye, her tim kêfxweş, rûgeş û zana ye. Binêre, hevalên te çi qas bi waneya werzîşê kêfxweş in. Her kes li ser piya li benda me ye. Em ê niha biçin, di nava vê xwezaya rengîn û xweşik de bilîzin. Em ê fêrî gelek tevgerên nû û baş bibin.
"Di nava wan kêliyan de min li derdora xwe nêrî, her kes li ser piyan e û dilgeş e."

Min ji bo van zanîn û agahiyan, spasiya mamosteya xwe kir û em bi rêzê ve derketin derve, me pir beşên lîstokan lîstin. Em beziyan û me pêşbirka bezê bi hevalên xwe re kir. Wê rojê, ez li hemberî du hevalên xwe, bûm yekemîn. Ez di nava heyecaneke pir mezin de bûm. Bi vî awayî, roja me bi tevger û xweş derbas bû. Ez bi saya werzîşê, pir kêfxweş û dilgeş bûm.



## Wateya Peyvan

**Derûnî:** Pskolojî, nefsiyet
**Saya:** bi xêra

# XWENDINA ROJNAMEYÊ



Rojek ji rojên biharê bû, xweza bi gul û kulîlkan hatibû xemilandin. Dengekî pir xweş dihat ku zindîbûna xwezayê diyar dikir.

Rojîn di nava vê xweşikbûna xwezayê de li ber deriyê mala xwe rûniştibû. Rojîn keçikeke esmer, kin û xwînşirîn bû. Di destê wê de rojnameya "Mizgîn" hebû. Rojînê bi baldarî rojname dixwend. Serhat jî lawikekî belav û di waneyên xwe de pir lewaz bû. Di serê wî de ji bilî lîstokan tiştekî din tunebû. Wê rojê jî Serhat ji dibistanê vegeriyabû. Bi lez û bez, cil û pirtûkên xwe avêtin malê û berê xwe da hola lîstinê. Di rê de rastî Rojînê hat. Bi awayekî bêhnçikayî rawestiya û got:

-Dembaş Rojîn.

-Dembaş Serhet.

-Tu çi dikî? Ka rabe em biçin ji xwe re bilîzin.

-Rojîn: Ez rojnameya "Mizgîn" dixwinin û piştre ji xwe re dilîzim. Ma tu qet naxwînî?

-Serhat: Na ez naxwînim, ma tu ji bo çi dixwinî?

-Rojîn: Ez ji xwendina rojnameyan, pir tiştên weke çîrok, mamik, pêkenok, gotinên pêşiyan, jiyana pir kesên navdar û hwd. fêr dibim. Di heman demê de, dema rojnameyan dixwînim xwendina min jî pêş dikeve. Ez fêrî pir gotinên kurdî yên nû jî dibim.

-Serhat: Bi rastî, ev tişt hemû di rojnameyê de hene?

-Rojîn: Belê, hêvîdar im tu jî bixwînî.

-Serhat: Rojîn tu dizanî xwendina min pir qels e. Ji ber vê yekê, ez pir caran di refê de dimînim.

-Rojîn: Ji bo ku xwendina te pêş bikeve, rojnameyan bixwîne.

-Serhat: Ji bo ez rojnameyan bixwînim, ma tu yê bi min re bibî alîkar?

-Rojîn: Belê, çima nebim alîkar.

Bi vî awayî, Rojînê alîkariya Serhatî kir. Serhat her roj rojnameya "MIZGÎN" dixwîne, piştre ji xwe re dilîze. Di encamê de waneyên wî baş dibin û xwendina wî pêş dikeve. Serhat, piştî demekê diçe cem Rojînê û spasiya wê dike. Rojîn jî bi kêfxweşî spasiya Serhatî dike ku hezkirina xwendina rojnameyê pê re çêbûye.

## Wateya Peyvan

**Pêkenok :** Qerf, nukte, henek

## Em Têbigihin

1- Di destê Rojînê de çi hebû?
2- Serhat lawikekî çawa bû?
3- Bi xwendina rojnameyê, mirov fêrî çi dibe?
4- Kê di aliyê xwendinê de alîkariya Serhatî kir?

## Rêziman

1- Li ser peyva "rojname" paşgira "van" zêde bikin, ji van her duyan, peyveke nû tê sazkirin. Wateya rojname û rojnamevan bizane û her yekê di hevokekê de bikar bîne.

## HÎNDARÎ

1- Ji mijara te xwendî, sûd bigire, rola zarokên di mijarê de zindî bike.
2- Rojnameyekê bîne refa xwe. Di vê rojnameyê de bûyereke girîng hilbijêre û ji hevalên xwe re bixwîne.
3- Bûyerên ku hevalên te dixwînin, bi balkêşî guhdar bike.

## TEST-2

**1- Ji bo em fêrî wateya peyvan bibin, em li çi dinêrin?**
**a**) Pirtûka waneyê
**b**) Ferheng
**c**) Pirtûka dîrokê

2-**Ji peyvên li jêr, kîjan bi alîkariya pêşgirekê hatiye sazkirin?**
**a**) Gavan
**b)** Veger
**c)** Hunermend
**d)** Dengdar

**3- Kîjan ji hevokên li jêr, hevoka pirsiyariyê ye?**
**a**) Mala me li serê kolanê ye.
**b**) Roja şemiyê ez ê biçim rezan.
**c)** Temenê te, çend salan ji yê bavê te kêmtir e.
**d)** Li çiyan di cih de hewa sar bû.

**4- Di hevoka"Îro Newrozê name nivîsî." de kîjan peyv lêker e?**
**a**) Îro
**b**) Newrozê
**c)** Name
**d**) Nivîsî

**5- Ji hevokên li jêr, ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî (Ş) nîşan bikin.**

**a)** Ji bo em fêrî wateya peyvan bibin, em li ferhengan dinêrin. (...)

**b)** Peyva "Dêrsim" navê giştî ye. (...)

**c)** Wateya peyva "mezaxtin", xerçkirin e. (...)

**ç)** Tîpên "Ç-K-P -T" hilmî û nehilmî ne (...)

# BEŞA 3

## GER EM LI HEV BIN



Bi qasî ku ew pir bi xîret in
Wî qasî ji minetan dûr ket in

Ji ber serfirazî û xîretê
Hilnagirin ew barê minetê

Li hev nakin lew bi yekcar hemî
Serkêş û ji hev cuda ne timî

Ger em li hev bûna bê dijberî
Hemûyan bida pey yek serwerî

Qenc ji neqencan dihatin nasîn
Berz dibûn xwedan huner û zanîn

## Wateya Peyvan

**Xîret:** bi wateya bişerefbûn, binamûsbûn hatiye bikaranîn.
**Serfiraz**: Serbilind
**Berz:** Bilind

## Em Têbigihin

1- Li gorî helbestê çima em li hev nakin?
2- Ger em li hev bin, wê encam çi be?
3- Helbesta jor a kîjan helbestvanî ye?

## HÎNDARÎ


Giringiya "yekgirtinê" ji bo neteweyan çi ye? Di refê de gotûbêj bikin.

# ÇARESERIYA NEXWEŞIYEKÊ

Rêzan, ji ber birîndariya xwe bêhiş ketibû. Mirovekî xêrxwaz ew rakir û bir nexweşxaneyê. Agahî da dê û bavê wî. Dê û bavê wî bi lezgînî hatin. Piştî nêrîna bijîşk, hat zanîn ku kûçikê ku Rêzan gez kirî, har bû. Bijîşk gelek xemgîn bû. Lewra Rêzan bi tirsnakiyeke mezin re rû bi rû mabû. Tirsnakiya mirinê! Di derbarê vê nexweşiyê de, bijîşkeke pispor a bi navê Nalîn li bajarê Qamişlo hebû. Bi lezgînî Rêzanê biçûk şandin Qamişlo. Dîrok 6'ê Tîrmeha 1999'an bû. Nalîna bijîşk, di vê nexweşiyê de gelek serkeftî bû.

Dijmîkroba nexweşiya hariyê, pisporek bi navê Pastor dîtibû. Nalîna bijîşk, ev dijmîkroba han li ser Rêzanê biçûk bi kar anî.

Nalîna bijîşk, roj bi roj Rêzanê biçûk dişopand, dibîne ku ew ber bi başiyê ve diçe. Nalîna bijîşk, berbanga sibehekê westiyayî û li ber pacê xilmaş bûbû, dema ku çavên xwe vedike, dibîne ku Rêzanê biçûk baş bûye.



## Wateya Peyvan

**Har:** Nexweşiyeke ku ji gezkirina lawirên weke kûçik, rovî, gur û hwd. çêdibe.

**Dijmîkrop:** Antîmîkrop

**Bijîşk:** Dixtor, hekîm

**Pispor:** dema kesek di pîşeyekê de zana dibe.

## Em Têbigihin

1- Ji bo çi Rêzan rakirin nexweşxaneya Qamişlo?

2- Nalîna bijîşk, çawa Rêzanê biçûk derman kir?

## Rêziman

**1-** Peyva "Şehîd Serhat " bi kurtî çawa tê nivîsîn?
**2-** Daçekên di nava mijarê de nîşan bike û mînakan jê bide.
**3-** Daçekên li jêr hatine nivîsîn, di hevokên jêr de binivîse.

**"di-de, ji-ve, bi-re"**
Azad … duh … nehatiye malê.
Sosin … refê … ma.
Şîlan … mamoste … çû.

**5-**Hevokên li jêr hatine nivîsîn, bi van peyvan temam bike.

**"şandin, hatin, birin"**
Dayîk û bavê wî ………
Mirovek xêrxwaz……….. cem bijîşk.
Bi lezgînî Rêzanê biçûk …………Qamişlo.

Hevokên te temam kirine, kîjan peyv, kirin û bizavê diyar dikin? Tu dizanî?
*Ji peyvên di nava hevokê de kirin û bizavê diyar dikin re '**lêker**' tê gotin.*

## HÎNDARÎ

1- Kurtenivîsa te xwendî, di lênûsa xwe de binivîse.
2- Serdana nexweşan karekî baş e.
3-Dijmîkrob çi ye? Bikaranîna dijmîkrobê, sûdek çawa dide mirovan?

# NAMEYA JI BO HÊVIYÊ

Hevala Hêvî:

Ev bûn pazdeh roj, ez ji we veqetiyame. Lê min ew qas bêriya we kiriye ku!…

Ez hêdî hêdî fêrî refa xwe dibim. Di refa me de hevalên gelek baş hene. yek heye navê wê Evîn e. Bi hinek taybetmendiyên xwe ve weke te ye. Ji ber vê, em zû li hev vehesîn.

Mamosteya min jî, pir baş e. Miroveke rûken e. Pir germ nêzîkî min bû. Navê min ji ber kiriye. Di waneya destpêkê de bi navê min gazî min kir. Got:"Tu çawa yî Negrî?"Ji bo dê û bavê min gelek pirs ji min kirin. Di derbarê dibistan û cihê ku ez jê hatime de agahî ji min xwestin. Min jê re gotin. Bi vî awayî, hevalên di refê de jî ez nasîm. Min ji bajarê Serê Kaniyê pir hez kir. Serê Kaniyê bajarekî gelek girîng e, her aliyê wê şîn e û kaniyên wê pir in.Tê gotin ku berê 365 kaniyên wê hebûn, lê mixabin piraniya wan çikiyane. Bi taybet, Girê Tilhelefê girîngî û roleke cuda dide bajêr. Ev gir, xwedî dîrokeke pir kevnar e. Bermahî û şopên dîrokî lê pir in. Lê hêj em li tevan negeriyane. Di bêhnvedana pêşiya me de, ez li Serê Kaniyê li benda te me. Em ê bi hev re bigerin, bilîzîn û bêhna xwe vekin. Ez li hêviya nameya te me.

ji te û tevahî hevalan re silav û hezkirinên xwe rê dikim.
Serkeftinê dixwazim…

***Şanenav***
***Negrî Sîpan***
***19.05.2013***

***Navnîşan***
***Kolana çiya***
**Jimar: 24/6**
**Sinceqa Xelîl/ Amûdê**



## Wateya Peyvan

**Bêrîkirin**: Hestên daxwaza dîtinê.
**Rûbiken**: rûgeş
**Bermahiyên dîrokî**: Tiştên ku li şûna cihên dîrokî mane

## Em Têbigihin

1- kê name nivîsiye?
2- Name ji bo kê hatiye nivîsîn?
3- Di nameya xwe de, di derbarê dibistana xwe ya nû de çi gotiye?
4- Behsa kîjan taybetmendiyên bajarê Serê Kaniyê hatiye kirin?
5- Dîrok, şanenav û navnîşan li kû derê tên nivîsîn?

## HÎNDARÎ

1- Nameyekê ji bo kesekî/e tu dinasî, binivîse.
Nameya we nivîsî, li gorî pirsên hatine kirin sererast bike.

- Tişta min dixwest jê re bêjim, min bê kêmasî nivîsiye?
- Min peyv û hevok rast nivîsîne?
- Min tîpên gir û nîşaneya xalê li cihê wan danîne?
- Min li jor milê rastê dîrok, li jêr milê çepê navnîşan daniye?
- Min li jêr milê  çepê nav û şanenava xwe daniye?

2- Piştî te sererastkirinên di nameya xwe de pêk anî, nameya xwe bi pênûseke ximav, li ser kaxezeke bêxêzik binivîse.

3- Nameya te nivîsî bixe namedankekê, li ser namedankê mînaka li jêr binivîse. Nameya xwe bibe postexaneyê û rêke.

## Mînaka namedankê

***Hinêr: Negrî Sîpan***
***Taxa Zerdeşt-Riya Rawestgehê***
***Jimar: 11/5***
***Serê Kaniyê***

PUL

***Birêz: Hêvî Çiya***
***Kolana Çiya***
***Jimar: 24/6***
***Sinceqa Xelîl /Amûdê***

# HINDO Û RINDO



**Hindo**: Êvar baş Rindoyê min.
**Rindo**: Bi xêr hatî.
**Hindo**: Way gewrem, min kefiyek xwe kirîbû. Dema ez hatim ji bo bêhnvedanê min xwest serdana Rindo bikim.
**Rindo**: Te kefî ji xwe re kiriye, ma ji min re çi?
**Hindo**: Ma wisa tê gotin?
**Rindo**: Lê çi tê gotin?
**Hindo**: Ma gotina "pîroz be, nexşe li sedên din be" tuneye?
**Rindo**: Pîroz be, nexşe li sedên din be.
**Hindo**: Bijî, ha! Wisa tê gotin. Gewrem dar jî li malê qediyabûn. Min hinek dar jî kirîn. Ez çûm min 15 kêş dar kirîn.
**Rindo**: Pîroz be nexşe li sedên din be.
**Hindo**: Wisa nabêjin!

**Rindo**: Ez çi dizanim? Te wisa got.
**Hindo**: Ew ji bo kefiyê bû.
**Rindo**: Êêê! Ez çi bêjim?
**Hindo**: Ma nayê gotin?"*Bi xweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne.*"
**Rindo:** Bi xweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne.
**Hindo**: Gewrem, ji ber ku ban qelişîbû, barana wê rojê barî hemû hat hundir. Min banî karkerekî kir, cihê qelişî hemû dagirtin.
**Rindo**: Bixweşî bişewitîne, rûne li xweliya wê bimeyzîne.
**Hindo**: Looo! Wisa nayê gotin.
**Rindo**: Ma çi tê gotin?
**Hindo**: Mane divê mirov bêje: "Eh eh maşalah, bi xweşî tê de rûne?"
**Rindo**: Eh eh maşalah, bi xweşî tê de rûne.
**Hindo**: Ez xweşberx bûm, gewrem, xweşberx.
**Rindo**: Ez jî xweştext bûm, gewrem, xweşberx.
**Hindo**: Wateya wê çi ye?
**Rindo**: Wateya wê "*şabûn*" e.
**Hindo**: Dê wisa bêje ha! Tu her bijî: "Ez bûm xweştext û xweşberx".

## Wateya Peyvan

**Gewrem:** Mezinê min.
**Nexşe li sedên din be:** Tu gelekên din jî, weke vê kevin bikî.
**Qediyan:** Bi dawî bûn.
**Bimeyzîne:** Binêre, temaşe bike.
**Maşalah:** Bereket, nezer lê nebe.
**Xweşbext:** Bextewar.

## Em Têbigihin

1- Hindo û Rindo li ser çi mijaran guftûgo dikirin?
2- Rindo bersivên çawa dida pirsên Hindo?
3- Di nivîsê de kîjan peyvê tu kenandî?
4- Hindo û Rindo kesên xwedî taybetmendiyên çawa ne?

## Rêziman

**Cînavk:**
Ji peyvên ku cihê navan digirin re cînavk tê gotin.
Cînavkên kesane yên xwerû: "Ez, tu, ew, em, hûn, ew"
**Mînak:**
**Ez** ji bo xwendina sala bê amade me.
**Tu** xwendekarekî zîrek î.
**Ew** bi gogê dilîze.
**Em** dost û hevalên hev in.
**Hûn** jî pirtûkan bixwînin.
**Ew** ji mamosteyên xwe hez dikin.

## HÎNDARÎ

1- Tu di derbarê Hindo û Rindo de çi dizanî? Bi çend hevokan binivîse.

2- Te temaşeyî kîjan lîstokên zarokan kiriye? Yekê ji wan, ji hevalên xwe re bêje.

3- Li bazarê tiştekî bikire, guftûgoya di navbera te û firoşkar de pêş ketiye, bi awayê guftûgo zindî bike.

4- Lîstokên wiha, em dikarin di sînema û şanogehan de bi gelek mirovan re temaşe bikin? Di holan de gelek axaftin û pîrozbahî tên kirin. Di cihên wiha de, xalên li ber çavan bên girtin, li jêr hatine rêzkirin.

- Di ketin û derketina deverên wiha de, kesekî bêzar neke.
- Divê tu bêdeng, di cihê xwe de rûnî, bi awayekî balkêş temaşe û guhdar bikî.
- Di demên pêwîst de, ji bo bêjer û hunermendan çepikan lê bide.

## SEMBOLA BERXWEDANÊ





Di gundê bi navê Newalê de, du gelên xwedî dîrokeke kevnar bi hev re dijiyan. Taxeke gund kurd bû û ya din jî suryan bû. Ev her du neteweyên kevin ji hemû aliyan ve, bi hev re di nava jiyaneke hevpar de bûn. Hemû pirsgirêkên xwe bi hev re û li gorî pîvanên civakî çareser dikirin. Di hemû aliyên jiyanê de alîkariya hev dikirin. Weke mînak: di bêrîvantî, şivantî, cotkarî û palehiyê de bi hev re bûn. Di nava aştî, wekhevî û aramiyê de jiyana xwe berdewam dikirin û ji hev re rêzdar bûn.

Rojekê du zarokên gund ên bi navê Katrîna û Nizar li rex gund ji xwe re kulîlk kom dikirin. Te digot qey, di nava xemla xwezayê de ji ber rengîniya derdorê winda bûne. Hemû aliyên wan bi gul û kulîlkan tijî bûbûn. Di nava wê xweşikbûnê de ji xwe re diaxivîn.

Nizar: Katrîna, ma tu dizanî sibe Cejna Newrozê 21’ê Adarê ye ?

Katarîna : Na, ma 21'ê Adarê çi ye ?

Nizar: Ev roj, ji bo me pir girîng e. Roja nûvejînê ye.

Katarîna : Çima girîng e?

Nizar: Ka were em ji xwe re li ser vê çêrgehê bêhnekê rûnin. Her du li kêleka hev rûniştin. Nizar bi qevda gulên komkirî re mijûl dibû, Katrînayê jî, ji xwe re tacek ji kulîlkan çêdikir.

Katarîna: De ka bêje, çima ev roj ew qas girîng e?

Nizar: Ev roj Newroz e. Cejna me ya neteweyî ye. Em her sal vê rojê pîroz dikin û cilên xwe yên neteweyî û xweşik li xwe dikin. Em agir vêdixin, li dora agir kom dibin û dîlanê digerînin.

Katrîna : Baş e, wateya vê rojê çi ye ?

Nizar: Wateya vê rojê berxwedan, azadî, wekhevî, serbilindî, aşîtî û aramî ye. Li hemberî zordariya Dehakî gelek egîd û xweşmirovan bi qehremanî şer kirin û şehîd ketin. Di encamê de Dehak şkest û serkeftin bû para gelên bindest. Lewre, em her sal vê rojê weke cejn pîroz dikin.

Katrîna : Şeva din dayîk û bavê min behsa Kawayê Hemdem dikir, gelo ew kî ye ?

Nizar: Hevala Katrîna, ev cejn heya beriya çend salan qedexe bû. Dijmin li ser gel çewisandineke bêsînor dimeşand; li ser çand û zimanê me qedexe hebû. Gelê kurd bi tunebûnê re rû bi rû mabû. Aha...! di wan salan de komek ciwan rabûn û li hemberî vê zordestiyê têkoşînek dan destpêkirin.

Katrîna: Erê....!

Nizar: Di nava wan ciwanên jîr, zana û wêrek de yek bi navê Mezlûm Doxan hebû.

Katrîna : Baş e, vî ciwanê jêhatî çi kir ?

Nizar: Mezlûmê leheng bi agirê bedena xwe çirûskek ronahî da gelê kurd û civakên bindest. Tirsek mezin xist dilê dijmin. Têhna agirê azadiyê da her çar aliyên welêt. Êdî li Kurdistanê têkoşîna azadî, aşîtî û demokrasiyê dest pê kir. Ji ber vê yekê, ji Mezlûm Doxan re dibêjin Kawayê Hemdem. Hevala Katrîna bi keda wan lehengên qehreman, îro em vê cejnê pîroz dikin.

Katrîna : Baş e heval, nexwe rabe em biçin amadekariyên şahiya Cejna Newrozê bikin.

Nizar: Beriya em biçin, ev gerdeniya ku min ji kulîlkan çêkirî, ger tu ji min bipejirînî, ez ê kêfxweş bibim. Ev bila diyariya Cejna Newrozê be.

Katrîna : Ev diyarî, ji bo min pir bi nirx e. Ez ê tu caran ji bîr nekim.

Nizar û Katrînayê destên hev girtin. Bi rûkenî berê xwe dan cihê şahiyê.

## Wateya Peyvan

**Çewisandin:** Perçiqandin, zordestî
**Qevd**: Baq, gurz
**Wêrek:** Bêtirs, bi Cesaret
**Newroz**: Roja nû

## Em Têbigihin

1. Li gund kîjan netewe dijiyan?
2- Newroz, di Kîjan rojê de tê pîrozkirin?
3- Çima ji Mezlûm Doxan re dibêjin Kawayê Hemdem?
4- Tu Cejna Newrozê çawa pîroz dikî? Binivîse.

## HÎNDARÎ

**1**-Tiştên ku tu di derbarê destana Kawayê Hesinkar de dizanî, vebêje.
**2**-Navê çar destanên kurdî binivîse.

# MAF

Dilê min, dilê şîp û şêr
Pozê çiya datînim jêr
Şer dikim îro ne wek pêr
Mafê xwe nadim bi zîv û zêr

Demarê eniya Egîd im
Tîrêjên çavên Cimşîd im
Ji bo mafê xwe şehîd im
Her heme, ez qet namirim

Dimirînim, qet namirim
Agir im, pêt im, bager im
Ji doza xwe venagerim
Ez li mafê xwe digerim

*Ş. Ferhad MASÎRO*



## Wateya Peyvan

**Doz:** Tişta ku mirov ji xwe re dike armanc.
**Şîp:** Şepal, çêlikên şêran.

## Em Têbigihin

1- Maf çi ye, çima helbestvan dibêje: "Ez li mafê xwe digerim"?
2- Wateya "Dimirînim, qet namirim"çi ye?
3- Helbestvan di malika duyem de xwe dişibîne çi?

## Rêziman

1- Sererêzikên helbestê bi tîpên çawa hatine nivîsîn?
2 -Hevoka li jêr, di lênûsa xwe de binivîse, bêhnokên wê bi cih bike.

"Hesp, kulîlk, çiya, daristan û ciwan ji dûr ve xuya dikin."

## HÎNDARÎ

1- Helbestê bi baldarî û bêdeng bixwîne.
2- bala xwe bide xwendina mamosteya/ê xwe, ka çawa helbestê dixwîne? Li kû derê kêm, li kû derê zêde radiweste?
3- Doza te çi ye? Tu çi qas li pey doza xwe digerî?
4- Ji bo ku mirov mafê xwe biparêze, pêwîst e, mirov çawa nêzîkî mafê kesên din bibe?

# GUMGUMOKA BIÇÛK

Hebû tunebû, di demên kevn de gumgumokeke biçûk hebû. Rojekê gumgumoka biçûk li daristanê digeriya. Cama ku li erdê diteyîsî dît. Lê nêrî ku ew neynikek e.

Gumgumokê demeke dûr û dirêj di neynikê de li xwe nêrî. Rûyê wê yê bitirs, serê wê yê mezin, diranên wê yên tûj û dûvê wê yê dirêj pir li xweşiya wê hatibûn.

Carekê çi bibîne! Li beramberî wê tîmsahek dihat! Tîmsah dibîne, lê tîmsah ji gumgumokê pir mezintir bû. Gumgumok dihizire, "Belkî ez jî têjika tîmsahê bim. Dema ez mezin bibim, ez ê jî bibim tîmsaheke wiha."

Gumgumoka biçûk êdî pesnê hevalên xwe nedida û xwe ji hevalên xwe mezintir didît. Her kesî jê re digot: "Dema tu mezin bibî, tu dê dîsa her gumgumok bimînî û tu nayê guhertin." Lê gumgumokê digot: "Na! Ez tîmsahek im."



Êdî tim li gel tîmsahan digeriya, tiştên wan dikir, wê jî hewl dida ku heman tiştan dubare bike. Rojekê dibîne ku tîmsah xwe li avê didin. Gumgumok jî xwe li avê dide, dixwaze melevaniyê bike. Dema ku tîmsahan xweş, xweş melevanî dikir, gumgumok jî binav dibû. Li milê din jî diqêriya: "Hawar! hawar! Min rizgar bikin, ez ê bixeniqim." Masiyê ku di wir re derbas dibû, bang li gumgumokê kir: "Ma tu jî ne tîmsah î? Tu jî melevaniyê bike!" “Na! Na! Ez gumgumoka biçûk im, melevaniyê nizanim min rizgar bike." Wê demê tîmsahekê dûvê xwe yê mezin dirêj kir, gumgumokê xwe pê girt û derbasî rexa avê bû. Tîmsahê got: Careke din, ji rastiya xwe dûr nekeve.

Gumgumokê gelek ji xwe şerm kir. Ji wê rojê û pê ve her dem xwest bibe gumgumoka baş.

## Wateya Peyvan

**Gumgumok:** Lawireke xişinde, xwînsar, li bejahiyê dijî
**Tîmsah:** Lawirekî xişinde ye ku di av û bejahiyê de dijî.
**Dûv:** Kurî, boçik, terî
**Teyîsî:** Çirisî, biriqî

## Em Têbigihin

1- Gumgumokê, çima xwe weke tîmsah didît?
2- Tîmsaha ku bi dûvê xwe gumgumok rizgarkirî, waneyeke çawa dide wê?
3- Çima ji beşa tîmsah wane dide gumgumokê re em dibêjin encam?
4- Te encameke çawa ji vê nivîsê derxist?

## Rêziman

**Peyvên hemwate:** Ji wan peyvên ku wateya wan weke hev in re peyvên hemwate tê gotin.
**Mînak:**
Axaftin , peyivîn
Mînak , nimûne
Poz , bêvil
Raketin , razan
**Peyvên dijwate:** Ji wan peyvên ku wateya wan dijî hev in re peyvên dijwate tê gotin.
**Mînak:**
Qencî , xerabî
Sar , germ
Reş , spî
Kin , dirêj

## HÎNDARÎ

Nivîsekê li ser lawiran bi awayekî vekirî û kurt binivîse û nîşaneyên xalbendiyê li ber çavan bigire.

# WELATÊ ME

Kurdistan yek ji welatên Rojhilata Navîn e. Xwediyê çand û dîrokeke pir kevnar e. Welatê me di dîrokê de rola dergûşa mirovahiyê lîstiye. Ji civaka xwezayî re malovanî kiriye. Weke ku gelek dîrokzan jî diyar dikin, çanda avabûna jiyan û civakîbûyînê li ser vê xakê pêş ketiye. Bi taybetî, axa ku dikeve navbera Çemên Dicle û Firatê, li qûntara Çiyayên Zagros û Torosan ku weke Mezopotamya tê nasîn. Ji ber ku li ser vê xakê mercên jiyanê pir destdayî ne, mirovan tim berê xwe dane vê xaka zêrîn.









Welatê me Kurdistan mîna bihuşta serzemîn e. Bi xweşikbûn, xeml û bedewiya xwe tê nasîn. Kurdistan di warê xwezayî û aborî de cihekî xweşdîmen û dewlemend e. Hebûna av, derav, deştên şîn û rengîn, çiyayên bilind û biberf, zozan û keviyên têr av û kanî, xweşî û rengîniyekê didin welatê me. Hebûna petrol û gelek cureyên heyberên kanzayî, dibin sedema dewlemendiya welatê me. Welatê me xwediyê çandiniyeke berfireh e. Di warê xwedîkirina lawiran de jî xwediyê risteke mezin e.

Kurdistan welatekî ku bi dewlemendî, xweşikbûn û dîroka xwe tê nasîn. Ev bedewî û xweşikbûn bûye sedem ku her tim dagirkeran, berê xwe daye xaka welatê me. Bi sedê salan welatê me hatiye parçekirin û dagirkirin.

Di Kurdistanê de ji bilî kurdan gelek neteweyên mîna: ermen, asûr, suryan, turkmen û ereb jî hene. Ji bilî ola îslamê (şîa, sunî), êzîdî, xiristiyan û cihû jî di welatê me de hene. Hêzên dagirker xwestine ku her dem dijminatiyê di navbera gelan de li ser vê xakê pêş bixin. Lê di Kurdistanê de rengê biratî û wekheviya di navbera gelan de bi dawî nebûye. Di roja me de mînaka vê ya herî berbiçav, li Rojava tê jiyîn. Li Rojava hemû netewe, civak û gel wekhev in. Her kes di raman û nêrînên xwe de azad e. Ev jî, nîşaneya welatekî xweş û dewlemend e.

## Wateya Peyvan

**Rojhilata Navîn:** Parzemînên Asya, Ewrûpa û Efrîqayê bi hev ve girê dide.
**Dergûş:** Landik
**Qûntar:** Jêra çiyan
**Bedew:** spehî, xweşik

## Em Têbigihin

1- Kurdistan, li kû dera cîhanê cih digire?
2-Ji kû derê re "Mezopotamya" tê gotin?
4- Li Kurdistanê kîjan netewe dijîn?
5- Kurdistan ji kîjan aliyan ve dewlemend e?

## Rêziman

**Gihanek:** Ji bêjeyên ku peyv û hevokan bi hev ve girê didin re gihanek tê gotin.
Hin gihanek: "û", "lê", "ku"
**Mînak:**
Zîlan **û** Serdar bi hev re çûn dibistanê.
Ez ji xwendina helbest **û** rojnameyan hez dikim.
Dixwest alîkariya min bike, **lê** karê wî hebû.
Ez hatim, **lê** tu nehatî.
Ew dixwîne **ku** zana bibe.
Ez dizanim **ku** tu ji min hez dikî.

## HÎNDARÎ

1- Tişta ku tu ji vê nivîsê fêr bûyî bi çend rêzan binivîse.
2- Girîngiya nasîna welêt, ji bo te çi ye?

# TEST-3

Her dem di odeya pirtûkên xwe de, rojnameyeke pêkenokan hilîne. Dema ku tu hinekî bêzar bûyî, hema zû wê veke û bixwîne. Di sînemayan de temaşekirina fîlmên pêkenokan ji dest bernede. Bibeze civata kesên ku xweş diaxivin, yariyan dikin û çîrokên seyr dibêjin. Li wan guhdar bike.

**Li gorî mijara jor Bersiva her du pirsên destpêkê bide.**

**1- Nivîskar dixwaze tu kengî rojnameya pêkenokan bixwînî?**

**a)** Dema ku te li hemberî tiştekî nerazîbûn nîşan da.
**b)** Dema ku tu kêfxweş bûyî.
**c)** Dema ku tu bêzar bûyî.
**d)** Dema ku tu ji tiştekî tirsiyayî.

**2- Nivîskar temaşekirina kîjan fîlman pêşniyar dike?**

**a)** Fîlmên karton
**b)** Rêzefîlm
**c)** Fîlmên pêkenokan
**d)** Fîlmên xemgîn

**3- Peyva "ronahî" di kîjan hevokên jêr de, di wateyeke cuda de hatiye bikaranîn?**

**a)** Ronahiya findê kêm bûye.
**b)** Şoreşa Kurdistanê, bi ronahiya şehîdên me pêş dikeve.
**c)** Ronahî nebe, em derdora xwe nabînin.
**d)** Şeva din demjimêr di dehan de ronahî vemirî.

**4- Ji navên li jêr, kîjan jê navê pêkhatî ye?**

**a)** Gul
**b)** Gulbihar
**c)** Gamêş
**d)** Şoreşger

**5- "Ger tu bi vî awayî pereyên xwe bimezêxî, *dê biqedin*."**

**Di vê hevokê de li cihê peyvên ku binê wan hatine xêzkirin, mirov dikare ji peyvên li jêr kîjanê binivîse?**

**a)** Dê zêde bibin.
**b)** Dê xerab bibin.
**c)** Dê xilas bibin.
**d)** Dê kom bibin.

**6- "Rojên min ên dibistanê bi kêf derbas bûn."**

**Dijwateya peyva "kêf" ya di hevokê de ji yên li jêr kîjan e?**

**a)** Tirs
**b)** Xemgîn
**c)** Coş
**d)** Kîn

**7- Di vê hevoka jêr de kîjan peyv, li şûna nav hatiye bikaranîn?**

"Gernas, pirtûk daye wî."

**a)** Pirtûk
**b)** Wî
**c)** Gernas
**d)** Daye

**8-Ji hevokên li jêr ya rast bi tîpa (R) û ya şaş jî bi tîpa (Ş) nîşan bikin.**

**a)Peyva** "gul" **navekî pêkhatî ye.** **(...)**

**b) Peyva "**Mizgîn**" çewt hatiye nivîsîn.** **(...)**

**c) Qertafa pirjimariyê bi peyva** "Zozan**" ve hatiye nivîsîn.** **(...)**

**d) Di dawiya hevoka** "Sibe ez ê biçim malê**" de lêker nehatiye nivîsîn.** **(...)**

# BEŞA 4

## AZADÎ

Rojekê pîremêrek li kêleka gund li ser kevirekî rûniştibû. Her du enîşkên wî li ser kabên wî û her du destên wî li ber lamên wî bûn. Bi baldarî, temaşeyî zarokên ku hinekî ji wî dûr ji xwe re dilîstin dikir. Di nava bîranînên zarokatiya xwe de, ji ser hişê xwe çûbû. Jiyana wî, weke şelîteke fîlman di ber çavên wî re derbas dibû. Lîstokên mîna: kalêmalê, baza koviyan û kûmkulavkanê yek bi yek dihatin ber çavên wî.

Ji nişkan ve dengek hatê: Bapîro, bapîro!...

Bapîr: "veciniqî û li xwe zivirî, neviyê wî li ber serê wî ye. Bêhneke kûr kişand". Hey, hey, hooo... ye.

Zarok: Xêr e bapîrê min î hêja, çi hat bîra te?

Bapîr: Tiştek nebû lawê min, ka em herin malê. Destê xwe danî ser serê wî, hinekî gemirand û her du bi hev re ketin ser rê, ber bi malê ve çûn.

Bapîr: Berxê min, dema ku tu mezin bibî, tu dixwazî bibî çi?

Zarok: Bapîrê min, ez dixwazim bibim nivîskar.

Bapîr: Giyanê min, ger tu bûyî nivîskar, tu dê çi binivîsî?

Zarok: Ez ê çîrok, helbest û pirtûkan binivîsim.

Bapîr: Bijî delalê min, dema ku tu mezin bûyî, dîroka berxwedana gelan, qehremaniyên pakrewanan û hovîtiya dijminan binivîse. Ger em îro di nava aramî û ewlekariyê de dijîn, bi saya ked û xwîna pakrewanan a pak e. Em hemû deyndarên wan in. Nivîsîna ked û berxwedana wan, erka we nifşê nû ye. Di dema me de, me nedikarî em fêrî xwendin û nivîsîna zimanê xwe bibin. Zimanê kurdî qedexe bû. Lê îro bi saya qehremaniya wan şehîdan hûn azad in; azad dixwînin û azad dinivîsin...

Kalê pîr çok bû ber lêwik û wiha got:
Vê şîreta min baş bixe guhê xwe û tu caran ji bîr neke. Azad bijî, azad binivîse û xiyanetê li xeyalên xwe neke. Wê demê, tu dê bigihîjî armanca xwe.

## Wateya Peyvan

**Enîşk:** Ejnî
**Kab:** Hestiyê çokê
**veciniqîn:** hilciniqîn
**Ewlekarî:** Ewlehî

## Em Têbigihin

1- Pîremêrî çi ji neviyê xwe re got?
2- Neviyê wî dixwest bibe çi?
3- Pîremêrî ji neviyê xwe xwest li ser çi binivîse?
4-Şîretên pîremêrî çi ne? Bi hevalên xwe re guftûgo bikin.

## Rêziman

1- Di hevoka jêr de qertafa ku rengê wê tarî hatiye nivîsîn, qertafa çi ye?

"Di nava bîranîn**ên** zarokatiya xwe de bûm."

2- Peyvên di hevoka jêr de cih digirin, kîjan peyv dijwate ne?

"Ciwan û pîr bi hev re bûn."

3- Di hevoka jêr de, bêhnokê bi kar bîne.

"Di zarokatiyê de tişta herî ez kêfxweş dikirim çêkirina komên zarokên biçûk û rêvebirina wan bû."

## HÎNDARÎ

1- Encama ku te ji vê nivîsê derxistiye, diyar bike.
2- "Azad fikirîn" tê çi wateyê? Di refê de gotûbêj bikin.

# PÎREMÊRD

Pîremêrdê
Çuwe qutabxaney gundê
Le hewşekeda rawesta
Dewreyan lêda mamosta
Ha xale giyan
Çît gereke; ha xale giyan
Pîremerdî bestezeman
Ke lawaz bû weku goçan
Wotî: Tu xuwa mamosta giyan
Fêrim nakey çon binûsim Kurdistan!



## Wateya Peyvan

**Pîremêrd:** Helbestvanekî kurd ê navdar **e**
**Qutabxane:** Dibistan
**Xale giyan:** Xalo can.
**Goçan:** Gopal
**Bestezeman:** Hejar, belengaz.

## HELBEST BI KURMANCÎ

# PÎREMÊRD

*Pîremêrî*
*Çûyî dibistana gund*

*Di hewşê de rawesta*

*Dewre dikir mamoste*

*Ha xalê can*

*Te çi divêt xalê can*

*Pîremêrê hejar*

*Ku lewaz bû weke gopal*

*Got: Tu xwedê kî mamoste can*

*Min fêr nakî çawa binivîsim Kurdistan!*

# BIHARA WELATÊ ME

Bihar, yekem werzê salê ye. Bayê biharê xweş û hênik e. Di biharê de gul û kulîlk dibişkivin. Giya şîn dibe. Cîhan dixemile. Firinde hêlînên xwe çêdikin. Hemû zindî piştî derbasbûna sermaya zivistanê, dest bi jiyaneke xweş û nû dikin.

Di biharê de, tevahî deverên Kurdistanê bi rengê kesk, sor û zer dixemilin. lewre, bihar ala rengîn tîne bîra mirov.

Her çi qas başûrê welatê me di nava bihareke rengîn de dijî, lê hîna bakurê welatê me di bin berfa dijwar de ye. Hêj gelê me yê wan herêman kulên sermaya zivistanê, ji bîr nekirine. Bandora xwezaya zivistanê ya li ser gelê me bi dawî nebûye. Bi gelemperî tevahî zarok û kulîlkên welatê me bi xweşiya biharê şad dibin.

Piştî meheke din hinek herêmên welatê me, dê ji nû ve ji berfê rizgar bibin. Kulîlkên van herêman, dê ji bin keviyên berfê serê xwe rakin û bi ronahiya rojê şad bibin. Dîsa di hinek herêmên welatê me de, ji ber germahiya havînê, kulîlkên geş dê biçilmisin. Ji ber ku welatê me gelek werzan bi hev re dijî.



## Wateya Peyvan

**Werz:** Demsal
**Kul:** Êş, nexweşî
**Gelemperî:** Bi awayekî giştî
**Xweza:** Sirûşt

## Em Têbigihin

1- Nivîs, li ser çi mijarê hatiye nivîsîn?
2- Di mijarê de kîjan herêmên welatê me, tên vegotin?
3- Bi hatina biharê re, çi guhertin di welatê me de çêdibin?
4- Destpêkê bihar, di kîjan herêmên welatê me de, bi cih dibe?
5- Dema kulîlk ji bin berfê derdikevin, bi çi şad dibin?

## Rêziman

**1-** Di hevokên jêr de qertafên pirjimariyê, diyar bike.

***Balinde hêlînên xwe çêdikin.***

***Hê jî gelê me yê wan herêman kul û xemên sermaya zivistanê ji bîr nekirine.***

## HÎNDARÎ

1- Herî zêde tu ji kîjan werzê salê hez dikî, çima?
2- Te çi wate ji vê mijarê derxist?

# KARÊ ÎRO NEHÊLE SIBE



Zarokên delal! Nizanim bala we kişandiye yan na? Gelek mirov nahizirin ku pêkanîna kar di dema wê de, ji bo mirovan girîng e. Cihê ku pêwîst e kar were kirin, nakin. Heta mirov dikare bêje, bi rastî û dirustî karê xwe pêk nayînin.

Xwe ji vê hînbûna xerab biparêzin! Hewl bidin ku hûn karê xwe di dema wê de bikin. Ger karek ji we hat xwestin, divê hûn bi cih bînin.

Zarokino! Karê ku we girtiye li ser milên xwe di dema wê de pêk bînin. Karê îro ne ji bo sibe, ta ji bo bêhneke din jî nehêlin. Çawa hûn ji êşa zirav û penceşêrê xwe diparêzin, ew qas jî xwe ji xemsariyê biparêzin. Bizanin kesên ku karê xwe di dema wê de nekin, wan riya binketinê hilbijartiye.

Dema hûn li kesên di karê xwe de serkeftî temaşe dikin, dibînin ku her yek ji wan weke demjimêrê tev digere. Sozê bidin xwe da ku hûn tevahî karê xwe di dema wê de pêk bînin. Piştre jî pêkanîna sozê deynekî giran e di stûyê we de ye. Vî tiştî ji bîr nekin.

Divê hûn jî dema ku demjimêra ketina ref û dibistanê temam bibe, bikevin refa xwe. Xwendekarên dereng tên, li derve dimînin. Bihizirin! Bi dehan xwendekaran berê xwe daye mamosteya xwe guhdarî û temaşe dikin. Di vê demê de xwendekarek teq, derî vedike û dikeve refê. Her wekî di mala xwe de ye dikene, bi aweyekî laqirdî li ser mêzêya xwe rûdine. Ev reftarekî nebaş e.

## Wateya Peyvan

**Xemsarî:** sersarî, ne jidil, ne cidî.
**Penceşêr:** Qansêr, seretan
**Laqirdî:** Henek, tinaz, tirane

## Em Têbigihin

1- Nivîskar dibêje: Xwe ji vê hînbûna xerab biparêzin. Ev hînbûna xerab çi ye?
2- Çima pêwîst e, em di dema xwe de biçin dibistanê?
3- Dema ku em karê xwe, di dema wê de nekin, dibe ku rê li ber çi veke?

# GEŞTA LI PERAVÊN GOLA WANÊ



Em di baxçeyê dibistanê de bi ref rêz bûn û piştî navxwendinê ketin ser rê. Piştî rêwîtiyeke kurt, em gihiştin ber perava Gola Wanê. Erêêê, ew şînatî çi bû? Şînatî bi şînatiyan re bûbû yek.

Kevirên parçeparçe yên di nava şînatiyê de, her yekî bazek dianî bîra mirov. Em neh-deh metreyan nêzîkî navenda golê bi cih bûn.

Mamoste Viyan:

-Zarokên delal! Kom bibin û li min guhdar bikin. Mamosteya we Koçerîn, dê derdorê bi we bide nasîn. Zarokên her du refan li dora mamoste kom bûn.

Mamoste Koçerîn:

- Zarokên hêja! Ji vê derê re dibêjin Newala Duquba. Ev hêşînahiya bêdawî ya hûn dibînin, Gola Wanê ye.

Evînê, mafê axaftinê girt û got:

- Mamoste, hîn jî Egîd dibêje derya ye.

- Ma dibe Egîd? Derya ji vê pehntir in û bi avên ji xwe mezintir re dibin yek. Li milê din Gola Wanê ji asta deryayê 1640 metreyî bilindtir e. Lê belê, tevahî deryayên ku li ser rûyê cîhanê hene, di heman pileya bilindbûnê de ne. Ava tevahî deryayan şor e, lê Gola Wanê hem şor e, hem jî bi soda ye.

Rojhat:

- Mamosteya min, ma Gola Wanê ne gola me ya herî mezin e?

Mamoste Koçerîn:

- Belê, gola me ya herî mezin Gola Wanê ye. Peravên Gola Wanê, bihuşta bakurê welatê me ne. Dirêjahiya peravên wê, bala her kesî dikêşe li ser vê bedewî û xweşikbûnê.

Piştî van agahiyan, me bi hev re xwarin xwar. Piştî xwarinê, me dest bi lîstokan kir û ji xwe re stran û çîrok gotin. Hêdî hêdî dema vegerê dihat. Dengê mamoste Viyan hat bihîstin:

- Zarokên delal! Ji bo vegerê amade bin. Bi xatirxwestina rojê re, zarokan jî xatir ji golê xwest û berê xwe dan malê.

## Wateya Peyvan

**Perav:** Berav, qiraxên avên rûbar, gol û deryayan
**Soda:** Heybereke ji bo paqijkirinê. Sodyûm karbonat.
**Bihuşt:** cinet

## Em Têbigihin

1- Mamoste, xwendekar birin kû derê?
2- Cudahiya di navbera Gola Wanê û deryayan de çi ye?
3- Di nivîsê de peravên Gola Wanê çawa dide nasîn?
4- Zarokan bi çi rengî geşta xwe derbas kir?

## Rêziman

Di hevoka jêr de peyvên ku tarî hatine nivîsîn, çi rewşa heyînan diyar dikin?

Zarokên her **du** refan, li dora mamoste kom bûn.

Derya li milekî ji vê pehntir e, li milê din bi avên ji xwe **mezintir** re dibin yek.

Peyva “**du**” jimara ref, peyva “**mezintir**” çawabûna avê diyar dikin.

## HÎNDARÎ

Di derbarê golê de tiştê tu ji nivîsê hîn bûyî, di lênûsa xwe de binivîse.

Di geştên we kirî de bûyereke ku bi te xweş hatiye, binivîse.

# AZADIYA TÛTÎ JI RIKEHÊ

Dibêjin, di rojên kevn de bazirganek hebû. Tûtiyekî wî bazirganî hebû. Tûtiyê bazirganî, tim û tim jiyana xwe di rikehê de derbas dikir û gelekî ji vê jiyana girtî dilêş û tengav bûbû. Rojekê bazirgan ji bo karê bazirganiyê bike, berê xwe dide bajarê Ûrmiyê. Ji zarokên xwe re dibêje:

- Ka we çi divê, ez ji we re bînim?

Her yekî tiştek xwest. Piştre bazirgan çû ber rikeha tûtî û got:

- Wa tûtiyê delal! Ez ê biçim rêwîtiya Ûrmiyê, ka daxwaza te çi ye?

Tûtî:

-Ger te di riya xwe de tûtiyên hevalên min dîtin, silavên min bigihîne wan û rewşa jiyana min ji wan re bêje.

Bazirgan:

- Baş e.

Bazirgan bi rê ket, di rêwîtiya xwe de, di daristaneke mezin re dibore. Ji nişkan ve, çavên wî bi refeke tûtiyan dikeve ku li ser çîmeneke rengîn awazan dixwînin. Daxwaza tûtî, hat bîra bazirganî. Bazirganî berê xwe da refa tûtiyan, silav kir û got:

- Ka pêşengê we kî ye?

Di nava tûtiyan de yek derket û got:

Ez im, pêşengê refê.

Bazirganî, serboriya tûtiyê xwe yê di rikehê de ji wî re got. Pêşengê tûtiyan xwe li erdê xist û bû mîna darekî hişk. Te digot qey ev salek e miriye. Bazirgan, gelek bi vê bûyerê êşiya, riya xwe girt û çû.

Piştî ku bazirganî karê xwe pêk anî û zivirî malê, ji her zarokekî xwe re diyariyek anîbû. bazirgan çû li ber rikeha tûtî rawestiya û lê nêrî. Tûtî jê pirsî, ka te ji min re çi aniye?



Bazirganî serê xwe tewand. Nexwest ew bûyera ku dîtiye, ji tûtî re bêje. Lê ji ber daxwaza tûtî, bazirganî got:

- Rewşa min û pêşengê tûtiyan ev e.

Dema tûtî axaftina bazirganî bihîst, wî jî hema xwe li erdê da û xwe mirand. Hingî bazirgan pê re axivî, ka rabe tu çima wisa dikî? Lê bê encam bû. Bazirganî di dilê xwe de got:

Diyar e, ji qehra hevalên xwe miriye. Rabû tûtî ji rikehê derxist û bir danî nav baxçeyê malê. Çawa tûtî xwe li derve dît, ji nişkan ve rabû ser xwe, çû ser darê û got:

- Bazirgan, te baştirîn xelat ji min re anî, ew xelat jî azadiya min a ji rikehê bû.

## Wateya Peyvan

**Tûtî:** Firindeyeke ku dipeyive.
**Awaz:** Dengê xweş, Mûzîk

## Em Têbigihin

1- Bazirgan diçû kû derê bazirganiyê?
2- Bazirganî ji zarokên xwe re çi anî?
3- Çima tûtî di rikehê de xwe mirand?
4- Encama  mirov ji vê çîrokê bigire, çi ye?

## Rêziman

Di hevoka jêr de cihê bêhnok kêm lê hatiye danîn, bêhnokan bi cih bike û di lênûsa xwe de binivîse.

**Bazirgan te baştirîn xelat ji min re anî ew xelat jî azadiya min a ji rikehê bû.**

# DEHLA ME





Xwesteka min a herî mezin, çûna dehlê û hinekî ji malê dûrketin bû. Wê demê li ser serê min ezmaneke bêdawî, di bin lingê min de axeke fireh dê hebûya. Min ê çiq bişikanda, ax bikola, lîstok bilîsta, tîr bavêta û bi qoskê ber bavêta. Li gorî daxwaza xwe ez ê bibeziyama. Min ê xwe hilavêta û bidaya ber qîran. Li wê derê ez ê bibûma zarokeke paqij û azad.

Di nava dehla me de malek hebû. Ji ber ku bavê min nexweş bû, bi me re nedihat nav dehlê. Ez, birayê min ê mezin, bapîr û Sisto çûn dehlê. Sisto, navê kerê me bû. Kerekî weke berxikekî birêz û weke seyekî dost bû; yekcar nedibezî. lewra, me navê wî kiribû Sisto. Leq û pehîn nedidan. Lê kêmasiyeke wî hebû, ew jî zêde diziriya. Dehla me, li qûntara çiyayê Cûdî bû. Li pêşiya xanî dîwarek, li ser dîwêr dareke berû û tayeke tawî jî hebû. Li pişt wan daran hawîrdor bi darên hejîran hatibû girtin. Dehla me, pir fireh bû. Li milê çepê, koxa Sisto û li pêşberî koxê jî bîrek hebû.

Tevahî bêzûrên malê li vê derê digihiştin. Di kenarê riya di nav dehlê re derbas dibû de genim, nok û bacan tên çandin. Derketina ser dara tawî, tirsnak bû. Mêşan dê bi mirov ve bidaya.

Me xweşiya firîkên nokan û şoqilan, weke kêvroşkan baş dizanî. Dema ku tirî  hîn qorix bû, jêkirina wî qedexe bû. Piştî gihiştina tiriyê ku me jê mewîj çêdikir, me berîkên xwe ji mewîjên bêsîsik dadigirtin û xweşiya bê dawî bû.

## Wateya Peyvan

**Firîk:** Beriya ku zadên bi lib hişk bibin jê re tê gotin.
**Tîr:** Amûra dikeve nava kevanê û tê avêtin.
**Qosk:** Çetel
**Leq:** Gezên lawirên mezin.
**Şoqil:** cureyeke baqila ye
**Dehl**: Cihên ku bêzûr, fêkî û şînahî tê de tên çandin

## Em Têbigihin

1- Dema ku nivîskar zarok bû, çima dixwest biçe nav dehlê?
2- Nivîskar bi kê re diçû nav dehlê?
3- Lawirê ku bi xwe re dibir nav dehlê, taybetmendiyên wî çawa bûn?
4- Kîjan benda mijarê dehlê dide nasîn?
5- Nivîskar bi kîjan fêkiyên dehlê ve girêdayî bû?

## Rêziman

1- Ji tîpên ku du dengên wan heyî re tîpên **hilmî û nehilmî** tê gotin.
**Tîpên hilmî û nehilmî ev in: "Ç, K, P, T"**

2- Tîpên dengdêr ên kurt û dirêj ên di hevoka jêr de di lênûsa xwe de binivîsin.
Li wê derê ez ê bibûma zarokeke azad û paqij.

3- Di zimanê kurdî de **pênc tîpên dengdêrên dengdirêj** û **sê tîpên dengdêrên dengkurt** hene.
Tîpên dengdêrên dengdirêj: "**a, ê, î, o, û**"
Tîpên dengdêrên dengkurt: "**e, i, u**"

# SELEMÊŞ



Bû zîqîna deriyê dar û vebû. Bavê min bi lez û bez hat. Rûyê wî bi xwêdan bû. Gelo ji nava zeviya bi dar, bi vê dasa sincirî ve çima hatibû?

Beriya ku em jê bipirsin, ji min re got:

- Bi lez! Selemêşa li cem kewarê bîne. Baqek nefel jî, ji bîr neke.

Di cih de ez bezîm, dema me li tengezariya bavê xwe dinêrî, me digot:

- Roja em li hêviyê ne, hatiye.

Dema min xwe amade kir û ez hatim binê daran, dayîka min kenî û dara tûyê nîşan da.

- Binêre Egîdê min, Çûka bihuştê hatiye!

Çiqê ku mêşa hingîvîn pê ve, tewa bû. Hê jî libên mêşan li hewayê dizivirîn. Di bêdengiya geştê de awaza wan bi nav û deng bû. Gulmika şilxê bi awayekî zindî hev û du girtibû. Bi wan pêlikên xwe yên kurt û tenik ve, li ber tavê direcifîn. Me hêdîka selemêşa ku şerbeta şekir û nefel lê hatiye kirin, nêzîkî şilxê kir. Dema dayîka min çiq hejand, mêş ket nav selemêşê û me selemêş li binê darê bi cih kir. Me serê wê bi giya girt.

Rûyê bavê min ê bi xwêdan, bi xweşî vedibû.

- Selemêş nîvî bû. Ez bawer dikim, şilxa destpêkê ye. Dibêjin şilxa destpêkê bi hêz e.

Serê xwe bi aliyê Mêhrê ve zivirand. Belê, ji vî milî ve weke ewreke biçûk derketin û hatin. Dara me ya tûyê hilbijartin. Niha mêşeke me heye. Bavê min, destên xwe yên nerm danî ser serê min û got:

- Ev mêşa te ye lawê min, divê tu çavê xwe vekî û baş lê xwedî derkevî.

Mêşvanî karekî zanînê dixwaze. binêre, sê beş mêşên hingivîn hene. Mêşên dayîk, mêşên nêr, mêşên karker. Kurê min, her mêşek karekî wê heye. Hemû mêş jî erkdar in. Mêş, zû digihin û zû zêde dibin.

Piştre me cihê selemêşa xwe li ber dîwarê xaniyê xwe yê li milê başûr çêkir. Ez gelek dilşad bûm.  Êdî selemêşeke min jî hebû.

## Wateya Peyvan

**Selemêş:** Cihên mêş tê de tên bicihkirin.
**Nefel:** Navê giyayekî.
**Mêhrê:** Navê gundekî yê Botanê ye. Hingivê wan bi nav û deng e.
**Şilx:** Mêşên ku bi aweyekî kom ji dayîka xwe cuda dibin.

## Em Têbigihin

1- Şilx, li kû derê bi cih bûbû?
2- Kê şilx xist selemêşê?
3- Ji bo şilxê bixin selemêşê, bi rêzê ve çi hat kirin?
4- Bavê wî di derbarê mêşan de, çi agahî da wî?
5- Selemêş, li kû derê bi cih bû?

## Rêziman

1- Di hevokên jêr de navên pirjimar ên bi rengê tarî hatine nivîsîn, bi awayê yekjimar di lênûsa xwe de binivîse.

Bavê min dest**ên** xwe yên nerm danî ser serê min.

Sê beş mêş**ên** hingivîn hene.

Ji bo em navên pirjimar weke navên yekjimar binivîsîn, pêwîst e em qertafa "**ên**"ê ji dawiya navên pirjimar rakin.

## HÎNDARÎ

Di derbarê jiyana mêşan û tiştên ku mêş çêdikin de, ji dapîr û bapîrê xwe bipirse. Bersiva wan rast binivîse.

# CÛDIYÊ MIRADAN

Tu rêwî yî ez bênav
Li min kiriye silav
Awirên te yên dijwar
Dilê min kir tarûmar

Ax Cûdiyê mirada
Gemî ji me re rada
Çima te serî bada
Tu yî dermanê derda

Gulên sor yên baxê te
Agirî, Sîpan bejna te
Çem, rûbar keziyên te
Dil ketime xemla te







## Wateya Peyvan

**Awir:** Mêzekirina tûj.
**Tarûmar:** Belawela.
**Mirad:** Xwestek, daxwaz, hêvî

## Em Têbigihin


1- Mirov ji malika yekem çi têdigihe?
2- ramana bingehîn ya helbestê çi ye?
3- Helbestvan çi wateyê ji 'keziyê' digire?

## Hîndarî

Di hevokên jêr de, qertafên li dawiya navan kêm hatine nivîsîn, temam bike û cihê vala dagire.

Agr... Sîpan bejna te
Ax Cudî..... mirada
Gul.... sorê baxê te

## ŞÊWAZA AXAFTINÊ



Rojekê dayîka Şêrzadî, gazî wî kir û got:

- Berxê min were em ji xwe re, hinekî biaxivin.

Piştre wiha dest pê kir:

- Lawê min, dema ku tu di dîwanekê de rûdinî, kêm bêje û pir guhdar bike. Eger te xwest ku biaxivî, axaftina kesekî nebire. Xwe bigire, heta axaftin temam dibe û dora te tê. Piştre biaxive. Ji ber ku bi vî rengî her kes dê li te guhdar bike. Dê bizanin ka te çi got û tu jî dê bizanî tu çi dibêjî. Axaftina xwe gelek dirêj neke. Bi qasî ku pêwîst dike biaxive. Di axaftina xwe de lezê neke û hêdî biaxive. Wisa şirîn û xweş biaxive da ku bandorê li ser guhdarên te bike.

- Lawê min dema ku yek bi te re diaxive, hiş û guhên xwe bide ser axaftina wî/ê. Xwe bi tiştên din ve mijûl neke. Ji ber ku başaxaftin û başguhdarkirin, nîşana perwerdekirineke baş û pêşketî ye.

Bi vî awayî, dayîka Şêrzadî dawî li şîretên xwe anî.

## Wateya Peyvan

**Mijûlbûn:** Xerîkbûn

## Em Têbigihin

1- Dayîkê, çima gazî lawê xwe kir?
2- Axaftina baş çawa ye?
3- Mirov bi axaftinên çawa, dikare bandora xwe li civakê bike?
4- Encama ji mijarê bê girtin çi ye?

## HÎNDARÎ

Tu dê di betlaneya havînê de çi bikî? Ji hevalên xwe re bêje.

# HÊVIYA BARANÊ

Hindik mabû ku şînatî kulîlkên xwe vekin. Lê mixabin, ev çend roj in, barana dihat hêvîkirin nehatibû. Pel ji têhna çilmisîbûn. Piraniya pel û giya ji têhna zer bûbûn. Ev xerab bû, hem jî pir xerab bû. Dilxweşiya gundê me, bi bihara têr baran dest pê dike û bi havîneke bêbaran bi dawî dibe. Gundî, bi nebarîna baranê pir xemgîn bûbûn û li hêviya baranê mabûn.



Rojekê, hêvî û daxwazên wan pêk hatin. Ji milê Girkê Legê ve ewrekî reş, giran, hêdî hêdî derket. Pir derbas nebû, tevahî rûyê ezman girt û ji ewran çarçoveyek çêbû. Li ezman vedana birûskan dest pê kir. Bapîrê min li cihê xwe diçû û dihat. Her li milê Girkê Legê dinêrî.

Dengek hat û got:

Egîd kurê min were were! wê bibare, hem jî wê baş bibare. ji nişkan ve ez ji mal derketim û hatim gel bapîrê xwe. Min li bapîrê xwe nêrî, bapîr ji kêfan vegeriyabû temenekî ciwantir û dikeniya.

Tevahî gundî ketibûn nav lez û bezekê, cilên ku li derve raxistî bûn, kom dikirin. Pisîk direviyan malan, nêzîkî derî radiwestiyan. Bi ketina dilopan a li ser axê re, bêhna xakê li derdorê belav bû, mirov ji wê bêhnê têr nedibû û barîna baranê dest pê kir. Dilxweşiya bapîrê min, hêjayî dîtinê bû. Li derve nêrî û got:

-Wey tu bi xêr bêyî! Ev, çi dengekî xweş e. Mişmişa avê, guhdar bike Egîd, guhdar bike!. Ev deng, mîna kîjan dengî ye, de ka bêje. Mîna dengekî zêrîn e.Ji nava dilê xwezayê derdikeve.

-Dibare.Wey pîroz be. Erdê weke havênê hevîr dipilpişîne. Rayê giyayên çandiniyê di bin erdê de asê dike.

Egîd:

-Bapîr, zeviya me ya li milê Girkê Legê pir baran stendiye. Bila bibare. Herî zêde, li zeviya me bibare!

Bapîr:

-Lawê min, bi wî rengî nehizire! Ma tenê pêwistiya me pê heye? Ma tenê em zindî ne? Ew dibe ezezîtî. Tenê xwehizirîn tiştek pir xerab e. Ji bîr neke, li dora me pir mirov û zindiyên din hene. Careke din wisa nebêje.

Egîd:

- Spas bapîro, te ya baş ji min re got. Ez carek din wisa nahizirim.



## Wateya Peyvan

**Havên:** tişta ku pê tê meyandin
**Êlim:** Gireke di navbera navçeyên Cizîr û Nisêbînê de
**Ezezî:** Kesê ku tenê bi xwe dihizire.

## Em Têbigihin

.

1- Bûyer di kîjan demsalê de derbas dibe?
2- Gundiyan çima barîna baranê pir dixwest?
3- Berî ku baran bibare, li ezman çi guhertin çêbû?
4- Bapîrî dengê çi, mîna dengê zêr didît?
5- Bapîr kîjan hizirîna Egîdî weke ezezî dinirxîne?

## Rêziman

1- Hevokên li jêr di lênûsa xwe de binivîsin. Di hevokan de binê peyvên kirin û bûyerekê diyar dikin, xêz bike.

-Cilên li derve raxistî kom dikirin.
-Pisîk direviyan malan.
-Tevayî gundî ketibûn nav lez û bezekê.

Di hevokê de, peyva ku kirina karekî diyar dike, jê re **lêker** tê gotin.

2- Di nivîsê de peyvên di nava hevokan de, bi tîpa mezin hatine destpêkirin serenav in. Van serenavan di lênûsa xwe de binivîsin.
3- Hevokên li dawiya wan baneşan hatiye danîn, çi diyar dikin?

**HÎNDARÎ**

1- Çi sûd û ziyana baranê heye, di lênûsa xwe de binivîse û ji hevalên xwe re bêje.
2- Serboriyeke xwe ya rojeke baranê binivîse.
3- Kesên ku dixwînin bi baldarî guhdar bike, ê ku baş dixwîne ji xwe re mînak bigire.

# COTKARÎ





Cotkarî di nava civaka kurd de, xwedî girîngiyeke mezin e. Civaka kurd cotkariyê kedeke pîroz dibîne. Ji ber vê yekê, di nava çanda kurdewarî de xwedî roleke mezin e. Mijara cotkariyê di gelek helbest, stran, çîrok û destanan de cih girtiye. Di aliyê hilberînê de xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Em dikarin bêjin, çanda zevî û cotkariyê cara yekem ji aliyê êlên kurdan ve hatiye pêşxistin. Ji xwe di gelek lêkolînên arkolojî û berhemên dîrokî de, ev yek hatiye tekezkirin.

Erdnîgariya Kurdistanê û avhewaya wê jî, ji vî karî re destdayî ye. Li ser xaka Kurdistanê çar werzên salê bi awayekî rêk û pêk derbas dibin. Xaka di navbera Çemên Dicle û Firatê de ya ku weke Mezra Botan jî tê nasîn, gelek bi berhem e. Jixwe baranên ku di demên xwe de dibarin, erka avdaniyê jî pêk tînin. Ji ber van sedeman, axeke pir berhemdar û sûdmend e. Debara piranî şêniyên civakê li ser çandiniyê ye.

Niha jî, li Kantonên Rojavayê Kurdistanê ev kar ji aliyê niştecihan ve bi awayekî xurt tê meşandin. Li Kantona Efrînê, zeytûn, fistiq û gelek cureyên bazirganî û lawirvaniyê hene û girîngiyeke pir mezin didin cotkarî û çandiniyê.

Bi taybetî, li Kantona Cizîrê çandiniya genim li pêş e. Civaka Rojava di roja me ya îro de jî li vê pîşeya bav û kalan xwedî derdikeve û vê çandê berdewam dike.

Gelek cureyên xwarinan yên weke: genim, nîsk, nok, birinc, fasûlî û hwd. berhemên vê pîşeyê ne. Her wiha, bêzûrên weke: bacan, xiyar, pîvaz û her cure fêkî bi riya cotkariyê tên bidestxistin.

Ji ber vê yekê, pêwîst e em xaka xwe ya pîroz bi heyberên kîmyayî gemar nekin û biparêzin. Eger em xaka xwe paqij negirin, nifşên ku pey me re tên, wê ji aliyê jiyanî ve tengezariyan bijîn. Di heman demê de hevsengiya xwezayê jî dê xerab bibe. lewra, parastina xak û xwezayê erka her mirovê xwedî wijdan, fikir û raman e.

## TEST - 4

**1- Debara Kantona Cizîrê zêdetir li ser çi ye?**
a) Çandinî û lawirvanî
b) Teknîk û pîşesazî
c) Neçîrvanî
d) Masîvanî

**2- Em ê çawa xaka xwe ya pîroz biparêzin?**
a) Em ê gelaşê xwe belav bikin.
b) Em ê heyberên kîmyayî bi kar bînin.
c) Em ê di çandiniyê de ava gemar bi kar bînin.
d) Em ê heyberên kîmyayî bi kar neynin.

**3- Ji qertafên li jêr, kîjan qertafa pirjimariyê ye?**
**a)** Geh
**b)** Dank
**c)** Ên
**d)** Î

**4- Kîjan peyva di hevoka jêr de lêker e?**
**"Hogir di hola dibistana Amadeyî ya Şehîd Koçerîn de bi goga hevalê xwe dilîze"**

**a)** Dibistan
**b)** Gog
**c)** dilîze
**d)** Hogir

**5- Di hevokê de peyva ku kirina karekî diyar dike, em jê re dibêjin çi?**

**a)** bireser
**b)** kirde
**c)** lêker
**d)** Hevalkar

**6- Ji hevokên li jêr, a rast bi tîpa (R) û ya şaş bi tîpa (Ş)**
**Nîşan bikin.**

**a)**Gundî bi nebarîna baranê pir kêfxweş dibûn û li hêviya barînê mabûn**.** **(...)**

**b)**Ewrekî reş û giran derket, çarçoveyek çêbû. Li ezman vedana birûskan destpê kir. **(...)**


Deryay Reş
Gurcistan
Rûsya
Ermenistan
Azerbeycan
Turkîya
KURDISTAN
Nahcevan
Îran
Sûrya
Îraq
Libnan
Deryay Sipî
IDIR
Qers
Sewas
EZEROM
Erzincan
Bazîd
Agrî
Mako
Caldiran
Dersîm
Cewlik
Elezîz
Mûş
Tetwan
Wan
Qotûr
Xoy
Bitlîs
Farqîn
Meletî
Elbistan
Firat
Semsûr
AMED
Batman
Sêrt
Başqela
Gever
Wirmê
Siverek
Merdîn
Şirnex
Clemerg
Zaxo
Meras
Besnî
Weranşiher
Nisêbin
Cizîr
EFRÎN
Entap
KOBANÊ
Riha
AMÛDÊ
QAMIŞLO
DERIK
Dicle
Dihok
Nexede
Mihabad
Iskenderûn
Heseke
Mûsil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bîcar
Kerkuk
Silêmanî
Merîwan
Sine
Helebce
Qesrî-Şirin
Kirmaşan
Xaneqîn
Ilam